# Hemû wekîlan berdin



Parlamenterê HDP'ê Îdrîs Baluken hat tehliyekirin lê hêj 10 wekîl dîl tên girtin. Li aliyê din Saziya Tiba Edlî û daraza tirk işkenceyeke nedîtî li Ahmet Turk dikin... *RÛPEL - 6*

# KNK'ê xwest çapemeniya kurd bi rola xwe rabe



**BILA ÇAR HÊLÊN KURDISTANÊ BIBIN YEK**

■ KNK bi mijara yekitiya neteweyî bernameyeke taybet li dar dixe. KNK'ê bi daxuyaniyeke nivîskî xwest ku hemû televîzyonên kurdistanî yên 4 parçeyên Kurdistanê bi awayekî zindî bernameyan ji gel re çêkin. Di daxuyaniyê de ev bang hat kirin: "Em dixwazin ku di 2'yê sibatê de yekitiya neteweyî di hemû malên kurdan de li Bakur, Rojhilat, Başûr, Rojava û derveyî welat bibe rojev."... *RÛPEL - 7*


# Ganî yewîye awan bibo

Nuştox Umur Hozatli û Fuat Onenî derheqê Yewîya Neteweyî ya Kurdan de qisey kerdî. Nuştox Hozatliyî va 'ganî tarîx ra ders bêro girewtiş' û qiseykerdişê xo wina domna: "Seba awankerdişê yewîya neteweyî û pîya cuyayîşî lazimî bi ti şertan çin o. Awankerdişê yewîya neteweyî de wezîfeyêko gird keweno milê ma roşnvîran ser de."... *R - 11*


ROJEVA **Medya**

31 Çile Sêşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 82







## Ji jinên ciwan hemleyeke nû

■ Tevgera Jinên Ciwan a Şoreşger diyar kir ku heta ku pêşî li hemû pêkanînên faşîst, mêtinger bigirin, ew dest bi pêvajoyeke nû ya çalakiyan dikin û wiha got: "Ev pêvajo dê di salvegera komploya navneteweyî de derkeve asta herî bilind." Her wiha li seranserê Ewropayê ji bo azadiya Ocalan meş hatin destpêkirin... R - 2/7



## Li girtîgeha Wanê îşkence heye


■ Li girtîgehênTirkiyeyê zext û binpêkirina mafên girtiyên siyasî di asta herî jor de ye. Girtîgehên ji aliyê AKP'ê ve tênê birêvebirin, bûne cihê îşkence û tacîzê. Girtiyê siyasî yê bi navê Adem Er nameyek ji ÎHD'ê re şand û diyar kir ku gardiyan îşkenceyê li girtiyên siyasî yên li Girtîgeha Girtî ya Wanê dikin... RÛPEL - 3



## 101 hezar 612 cayê karî padîyayî

■ Goreyê doneyê ke Konfederasyonê Hunermend û Esnafanê Tirkîya (TESK) dayo, serra 2016 de pêro pîya 101 hezar 614 esnafî cayê karê xo padayî. Na hûmare 2015 de nizdîyê 97 hezar 715 bî. 3 aşmanê peyênan yê 2016 de her aşme dormeyê 10 hezar esnafan kilît da berê xo ro. Amed de tena 10 hezar cayî padîyayî. RÛPEL - 11

# Ji bo welatekî aram û ronî NA



**Karayilan da zanîn ku li Tirkiyeyê bi tenê Tevgera Azadiyê li ber xwe dide û ev berxwedan ji bo hemû gelan e...**

**Karayilan bal kişand ser rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û got ku berxwedana herî mezin li Îmraliyê bi pêş dikeve...**

**Der barê polîtîkayên têkçûyî yên AKP'ê de jî Karayilan da zanîn ku ji bo nixumandina têkçûna xwe êrîşên xwe zêde dike...**

**Karayilan da zanîn ku PKK bi awayekî stratejîk li mijara yekitiyê dinêre û diyar kir ku meyla hemû kurdan li ser yekitiyê ye...**

**Têkildarî şerê Sûriyeyê jî Karayilan da zanîn ku Erdogan windahiyên xwe vedişêre û niha xwe avêtiye bextê rûsan...**

**Karayilan têkildarî şerê li Bakur jî got ku AKP'ê êrîşên li ser gel zêde kirine, li dijî vê divê gel xwe bi rêxistin bike...** R- 6

**LI DIJÎ FAŞÎZMÊ BIBIN YEK**

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Murat Karayilan diyar kir ku li Tirkiyeyê, hemû kesên li dijî faşîzmê, divê bibin yek û wiha axivî: "Ger pêşî li vê pêla faşîst bê girtin, dê Tirkiyeyeke ronî û aram ava bibe. Ger ev pêla faşîst bi ser bikeve, Tirkiye dê salên dirêj di nav tariyê de bigevize."

**HAWÊRA NA MEZIN DIBE**

Li aliyê din gelek derdoran zend û bend badane da ku di referandûmê de 'NA' bi ser bikeve. Meclisa Jinan a DBP'ê li Amedê starta kampanyaya NA'yê da. Rêxistinên ciwanan ên Mêrsînê, şêniyên Mêrdînê da zanîn ku dê ji dîktatoriyê re bibêjin 'Na'. Hunermend Fazil Say jî got ku ew jî dibêje 'NA'... RÛPEL / 2-6-7

## Li dijî yekzilamiyê NA

**Di pêvajoya referandûmê de wisa xuya dike ku dê dengê jinan çarenûsê diyar bike. Jin dibêjin ku dê rê nedin pergala yekzilamiyê**



Meclisa Jinan a DPB'ê têkildarî referandûmê li Navenda Giştî ya DBP'ê civîna çapemeniyê pêk anî. Di daxuyaniyê de li dijî eniya "yekzilamî" bang li jinan kir ku di eniya 'NA' de xwe bi rêxistin bikin û li ber xwe bidin. Jinên ku sazî, pîşe û xebatên wan cuda ne, li dora 'NA'yê bûn yek û dengê xwe bilind dikin. Jinan diyar kir ku dê rê nedin pergala yekzilamiyê... *RÛPEL - 2*




Her çend partî û sazî ji bo kampanyaya refernadûmê hêj daneketibin qadan jî li ser medyaya civakî kampanyayeke mezin didome û derdorên dibêjin 'Na' afrînertir û sempatîktir in.

**LI ŞIRNEXA** ku zêdeyî nîviyê bajêr di qedexeyê de hatiye hilweşandin, parlamentera HDP’ê ya Şirnexê Aycan Îrmez, endama Meclisa Partiyê ya HDP’ê Nuran Îmîr, endama Meclisa Partiyê ya DBP’ê Harîka Peker û xebatkarên TJA’yê ji aliyekî ve serdana gel dikin û ji aliyê din ve ji bo ‘na’yê dest bi xebata referandûmê kirin. Di dema serdana gel de parlamenter Îrmez ku rastî mirovê ji berfê hatiye çêkirin hat, dema dît mirovê ji berfê hatiye çêkirin nîşaneya serkeftinê kiriye û li ser bedena wî jî tîpa, “H” ku tê wateya, ‘na’ hatiye nivîsîn, diyar kir ku gelê Şirnexê ji niha ve biryara xwe daye ku dê di hilbijartinê de bibêjin, ‘na’. Îrmez da zanîn ku gelê Şirnexê dizane ku di referandûmê de ‘erê’ bi xwe re dîktatoriyê tîne û ji niha ve biryara ‘na’ya li hemberî zihniyeta yekmiroviyê daye. **ŞIRNEX - DÎHABER**



## Li dora NA’yê bûn yek deng



Li Stenbolê jinên ku xebat, pîşe, raman, reng û saziyên wan cuda hemû di referandûmê de li dijî pergala serokdewletiyê û zilmê dibin yek û ji bo ku bi dengekî xurt û berz bibêjin ‘na’ dibin yek. Jinên ku dibêjin na sedema çima ‘na’ aşkera kir. Berdevka Platforma Em Dê Cînayetên Jinan Rawestînin Fîdan Ataselîm, diyar kir ku jinên bêdeng ne dikarin dengê xwe bi kar bînin û ne dikarin bertek nîşan bidin û wiha got: “Ji bo ku jin li ser piyan bimînin û bi dengê bilind bikenin divê bi hev re bêjin na.”

Rêvebera Komeleya Piştevaniya LGBTÎ ya Stenbolê Kivilcim Arat, sedema ‘na’yê wiha got: “Em naxwazin pêşeroja me zilamek diyar bike. Em dixwazin der barê pêşeroja xwe de bi xwe biryarê bidin. Ji ber ve yekê em dibêjin ‘na’.”

Endama Meclisa Partiya Demokratik a Gelan (HDP) Semra Uzunok jî anî ziman ku di serdema AKP’ê de ciwan tên şewitandin û bê kar in wiha got: “Şer, xizani, betalî, zêde dibe. Ji bo welatekî xweş û aştiyê divê em bi hev re bibêjin ‘na’. Ji bo li vî welatî her roj jin neyên kuştin ez dibêjim “na”. Ji bo betalî bi dawî bibe ez dibêjim “na.”

Rojnameger Yazgulu Aldogan jî anî ziman ku 40 sal e li vî welatî rojnameger e û rastî zext û zilmê tê û ji bo ku ev zext û zilm bi dawî bibe di referandûmê de dibêje ‘na’.

**BO HEBÛNA NAVÊ JINAN NA**

Hunermend û dansvan Zeynep Tanbay jî diyar kir ku jin her dem alîgirên aştî, azadî û edaletê ne û wiha got: “Em ê bibêjin na. Ji bo azadî, aştî û wekheviyê em ê bibêjin ‘Na’.”

Endama Koordînasyona Tevgera Jinên Azad (TJA) Gulistan Aydin jî diyar kir ku îktîdara AKP’ê 14 sal e serdestiyê li ser jinan dimeşîne û ji bo dawî li kuştina jinan bê û polîtîkayên jinan înkar dikin û tune dihesibînin bi dawî bibin, dibêjin ‘na’.

Endama Şêwirmendiya Jinan a Bodrumê Fusun Dogan jî anî ziman ku ji bo astengiyên li pêş deng û vîna jinan bi dawî bibin dê bibêje na û ev tişt got: “Divê em pirreng û yekdeng bin. “

Muzîsyen Esra Lora Yilmaz jî diyar kir ku wekî muzîka xwe dixwaze bi pirdengî û pirrengî bijî û ji ber vê yekê dibêje ‘na’. **STENBOL - DÎHABER**

# Ji 9’ê Sibatê heta 15’ê Sibatê çalakî

**Tevgera Jinên Ciwan a Şoreşger diyar kir ku heta ku pêşî li hemû pêkanînên faşîst, mêtinger bigirin, ew dest bi pêvajoyeke nû ya çalakiyan dikin û wiha got: “Ev pêvajo dê di salvegera komploya navneteweyî de derkeve asta herî bilind.”**



Tevgera Jinên Ciwan a Şoreşger daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku wan ji bo hemû jinên ciwan ên Kurdistanê dest bi pêvajoyeke nû ya têkoşînê kiriye.

Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku berxwedêrî, têkoşerî û sekna serî li ber teslîmiyetê ya natewîne ya tevgera azadiyê ya jinên Kurdistanê, di nava tevgera jinên ciwan a şoreşger de şênber bûye û wiha hat gotin: “Zîhniyeta faşîst, mêtinger û nêrza, ji bo têkbirina vê têkoşînê çi ji dest hat, kir. Bi mêjiyê ‘di destpêkê de li jinan bidin’ dest bi qirkirineke mezin a jinan kir.

Di 9’ê Çileya 2013’an de, di şexsê rêheval Sara, Rojbîn, Ronahî de êrîş li hemberî tevgera me ya azadiya jinan hat kirin û hewl hat dayîn ku têkoşîna me bê tunekirin. Jinên kurd bi berxwedaneke mezin bersiv da vê hewldana tepisandinê, li Cizîr, Sûr, Silopî, Gever, Nisêbînê li dijî desthilatdariya mêran berê xwe da ber bendan û bi vî rengî bûn nîşaneya lehengiyê. Jinên berxwedêr ên ciwan, di şexsê rêheval Fatma, Pakîze û Sêvê de careke din bûn hedef. Ji ber ku xetereya herî mezin ji bo pergala serdestiya mêran, jinên birêxistinbûyî û berxwedêr in.”

Tevgera Jinên Ciwan a Şoreşger destnîşan kir ku ji 9’ê Sibatê heta 15’ê Sibatê roja pêkhatina komploya navneteweyî ku li hemberî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêk hat, divê jinên ciwan ên şoreşger ji bo pêşîgirtina li van polîtîkayan, jiyanê li dijmin bikin jehr û wiha hat got: “Em li dora paradîgmaya Rêbertî li hev bicivin û bi têkoşîna xwe, jiyana azad ava bikin. Em terora mêraniyê hilweşînin û civakeke xwe dispêre azadiya jinan biafirînin. Em bang li hemû jinan dikin ku bi şiyara ‘Bi pêşengiya jinên ciwan, heta serhildan û azadiyê; tolhildan’ tev li têkoşînê bibin. Qedera sala 2017’an dê ji aliyê asta têkoşîna me ya li dijî komploya navneteweyî ve diyar bibe. Serkeftin dê bibe ya jinên ciwan ên bi çalakiyan dane ser şopa rastiyê.” ***AMED - ANF***

## Divê jin xwe bi rêxistin bikin

Meclisa Jinan a Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) têkildarî pêvajoya referandûmê li Navenda Giştî ya DBP’ê civîneke çapemeniyê pêk anî. Endama Desteya Rêveber a Navendî Fikriye Aytîn li ser navê Meclisa Jinan daxuyanî da. Aytîn diyar kir ku ‘sîstema serokdewletiyê” ku bi hevkariya AKP-MHP’ê anîn rojeva gel, berovajî tiştên ku têne gotin, li Tirkiyeyê dê kaos û krîzê girantir bike.

Aytîn da zanîn ku bi derbeyeke li dijî vîna gel wekîlên jin û hevşaredar hatin girtin, bi sedan saziyên jinan bi awayekî nehiqûqî hatin girtin. Aytin di berdewama axaftina xwe de anî ziman ku pêdivî bi hişmendiya çareseriyê ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan heye û wiha got: “Ji bo jiyaneke nû, mirovahiyeke nû û aştiyeke nû divê azadiya Abdullah Ocalan bikeve rojevê. Aytîn diyar kir ku tekane rêya ku rejîma dîktatoriyê asteng bike ku bi xwe re yekperestî, nîjadperestî, zayendperestiyê tîne, çareseriya pirsgirêka kurdan e.”



Aytîn got ku her kes dibêje ‘na’ û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Em jin li dijî vê rejîma dîktayê dikarin eniya ‘na’ bi rêxistin bikin û asteng bikin. Em wek Meclisa Jinan a DBP’ê li dijî eniya ‘yekzilamî’ bang li jinan dikin ku di eniya ‘na’ de bibin yek û li ber xwe bidin.” ***AMED - DÎHABER***

## Ji bo temsîliyeta wekhev **NA**




Komeke jinan hatin cem hev û xwe wek ‘Jinên Dibêjin Na’ bi rêxistin kir û roja şemiyê li Hill Otelê ya Taksîmê daxuyaniyek da çapemeniyê û starta kampanyaya ‘na’ da.

Endama Koordînasyona Jinên Dibêjin Na Zeynep Altinkaynak têkildarî kampanyaya ‘na’ de axivî û wiha got: “Em ji gotina ‘na’ natirsin. Em ê ji bo mafê xwe yên temsiliyeta wek hev têbikoşin. Ji ber ku em ji texmînên wan zêdetirin û em ê bên cem hev û ji dengê jinê ‘na’ bilind bikin û li ber xwe bidin.”

Altinkaynak di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku di serdemeke ku gotina ‘na’ qedexeye de diçin referandumê û got ku ew ji gotina ‘na’ natirsin û gotin dê li dijî tarîkirina pêşeroja xwe rawestin û têkoşîna xwe bilind bikin. ***STENBOL - ŞÛJIN***

## Xwarinên Colemêrgê didin nasîn

Li navenda Bajarê Colemêrgê esnafên bi navê Sevda Keskin û Ozlem Atay bi armanca danasîna xwarinên herêmî û debara malbatê pêjgeha ku vekirine rastî eleqeyeke mezin tê. Jinên ku Xwarinên Herêmî ya Hera vekirine ji aliyê welatiyên herêmê ve rastî eleqeyeke mezin tên. Jinên esnaf bi vê pêjgehê hem danasîna xwarinên herêmê dikin, hem debara malbatê dikin û hem çanda xwarinên herêmî didomînin. Jinan bi derfetên xwe û piştgiriya Serokatiya Daîreya Kargeriyên Navîn (KOSKEB) pêjgeh vekir û 4 kes îstîhdam kirin.

Nanpêj û esnaf Atay, diyar kir ku hem di aliye xwarinê de û hem jî di aliyê hilberînê de di nava şêwirmendiyê de ne û wiha got: “Em ji hemû beşên civakê bertekên erênî digirin û ev ji bo jinan bûye hêvî. Me dît ku bi vî karî me rê li pêş gelek jinên din vekir. Gelek hevalên me yên jin hatin bi me şêwirîn.”

Esnaf û nanpêj Keskin jî diyar kir ku wan bi derfetên kêm dest bi karê pêjgehê kir û wiha got: “Me baweriya xwe bi xwe anî. Heke jin bixwazin, dikarin her tiştî bikin. Em jî ji vê yekê bawer dikin. Em rastî gelek pirsgirêkan hatin û me hemû çareser kirin. Me nîşan da ku jin bi tifaq û bi xwe bawer bin, dikarin her tiştî bikin. Em dibêjin bila ji xwe bawer bin û bi biryar bin. Heke jin bixwazin dikarin her tiştî bikin.” **COLEMÊRG - DÎHABER**



www.arsivakurd.org

## HPG: Ji bo gelê xwe şehîd bûn

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê nasnameya 3 gerîlayên par jiyana xwe ji dest daye, aşkere kir. HPG'ê gerîla Rewşen Metîn (Rewşen (Urek), Mazlum Tekman (Selîm Dundar) û Demhat Amed (Suleyman Şaşmaz) ên di demên cuda de jiyana xwe ji dest da, bi bîr anîn.

Di daxuyaniya HPG'ê de wiha hat gotin: "Ji bo bîranîna rêhevalên xwe, em ê erk û wezîfeyên xwe bi ser bixin."

Her wiha Koordînasyona Giştî ya YPS'ê da xuyakirin ku du şervanên wan ên bi navê Hava Asparslan (Ezda) û Ozgur li Qosera Mêrdînê şehîd ketine.

YPS'ê da zanîn ku dê nasnameya endamê xwe yê bi navê Ozgur piştre aşkera bikin. BEHDÎNAN - ANF

# Rewşa Ataman ê rastî îşkenceyê hat giran e

**Welatiyê gundê Eganîsa Erdîşê Halît Ataman ku di bin çavan de rastî îşkenceyê hat û xwîn çûbû ser mejiyê wî dîsa rakirin nexweşxaneyê û hate zanîn ku rewşa wî giran e**



Tîmên Taybet di 18'ê mijdara 2016'an de bi ser malbata Ataman de girtibû û xaniyê wan şewitandibû. Di şewatê de Hediye Ataman di xanî de şewitî û jiyana xwe ji dest dabû.

Hevjînê Hediye Ataman Halît Ataman (37) jî dema bi hawara hevjîna xwe de çûbû li gel 2 xizmên xwe hatibû binçavkirin. Halît Ataman di bin çavan de rastî îşkenceya giran hatibû û xwîn çûbû ser mêjiyê wî. Ataman, dema hatibû berdan û demekê li malê mabû, rewşa wî giran bûbû, rakirin Nexweşxaneya Lekolîn û Perwerdehiyê ya Zanîngeha Yuzuncu Yilê ya Wanê. Di tedawiyê de hatibû fêmkirin ku Ataman ji ber ku di bin çavan de rastî lêdanê hatiye xwîn çûye ser mêjiyê wî.

Ataman ku di 6'ê çileyê de ji nexweşxaneyê tabûrcî bû, du roj berê dîsa ji ser hişê xwe çû û rakirin nexweşxaneyê. Ataman ku rakirin Nexweşxaneya Taybet a Lokman Hekîm piştî fîlmê serê wî hat kişandin, hat zanîn ku xwîn çûye ser mêjiyê wî. Ataman rakirin beşa komayê û hat diyarkirin ku tenduristiya wî gelekî xerab e. *WAN - DÎHABER*

## 'Dewlet niha çawa ye berê jî wisa bû'

Di salên 90'î de li Kurdistanê bi polîtîkayên îmha, înkar û pişaftinê bajarên nehatin valakirin û gundên nehatin şewitandin neman. Yek ji van gundan jî gundê Goksu yê Bismila Amedê ye. Şahida demê Hesîna Guler a 74 salî diyar dike ku wê demê bi zora dewletê neçar maye di 24 saetan de gundê xwe terk bike.



Hesînayê wiha berdewam kir: "Dewlet niha çawa ye, berê jî wisa bû. Dîsa îşkence heye, dîsa binçavkirin û girtin hene. Sedema vê jî ji ber ku em kurd in. Li gundê me pevçûn pêk hat û piştre gotin gund terk bikin. Me tiştek ji mala xwe negirt û em hatin kolanên Amedê. Em perîşan bûn. Zarokên min li erdê radizan. Dewletê li hemberî hevjînê min komplo pêk anî. Çeka wî girtin û di çalakiyê de bi kar anîn. Piştre hevjînê min girtin û îşkence lê kirin. 5 salan di girtîgehê de ma. Hat berdan û dîsa bi hinceta cezayê wî heye dîsa hat girtin. Hevjînê min 76 salî ye û hîna di girtîgehê de ye.

Guler da zanîn ku dewlet niha çawa ye berê jî wisa bûye û bi gotinên 'tiştên hatin serê me ez û zarokên xwe dizanin'. Guler bal kişand ser zilma dewletê û li dijî polîtîkaya şer a li dijî kurdan bang kir ku bila êdî dayik negirîn. *AMED - DÎHABER*

## Pêkanînên girtîgehan pirsgirêkan kûrtir dikin



Li Girtigeha Tîpa E ya Edeneyê li qawîşa zarokan ji ber şewata di 18'ê çileyê de zarokên bi navê Muhammed Erdogan û Ferhat Kaya jiyana xwe ji dest da, yek jê giran 3 zarokên girtî û 3 gardiyan jehrî bûn. 3 zarok piştî hatin dermankirin carake din şandin girtîgehê. Di çarçoveya lêpirsîna ku ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Edeneyê ve hat destpêkirin de îfadeya 3 zarokan û hin gardiyanan hate wergirtin û zarokê bi navê R.K. jî sewqî Girtîgeha Zarokan a Sîncanê hat kirin. Serokê Komîsyona Girtîgehan a Baroya Edeneyê parêzer Tugay Bek diyar kir ku zarok ditirsin têkîldarî bûyerê biaxivin.

Serokê Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Edeneyê Îlhan Ongor da zanîn ku giliyên berê têkildarî îşkenceyên li qawîşên zarokan ên Girtîgeha Tîpa E ya Edeneyê kirine bi bîr xist ku bi bêşopandinê bi encam bûye. Ongor bi lêv kir ku li hemberî neçareseriya pirsgirêkan neçar dimînin û bi polîtîkaya necezakirinê pirsgirêkan kûrtir dike. *EDENE – DÎHABER*

## 4 jin nayên berdan

**Li Sûra Amedê di serdagirtina malan a 26'ê çileyê de 3 jinên bi navê Asli Yetîşir, Leyla Bayram û xebatkara DÎKASUM'ê Nupelda Bayram hatibûn binçvakirin. Li gorî agahiyên ku ji parêzerê wan hatin wergirtin, hat diyarkirin ku jinên li ser 'gumana maqûl' hatin girtin ev 4 roj in di bin çavan de tên girtin, di odeyeke sar a ku tamîra wê neqediyaye de tên ragirtin. Parêzer aşkera kir ku dema binçavkirina jinan dirêj bûye û wiha got: "Avê nadin wan û ev 4 roj e heman cil û berg li ser wan in. Li gel ku kinc ji wan re hatine jî negihaştine wan." Her wiha parêzer destnîşan kir ku jinên di bin çavan de ne bi neheqiyê re rû bi rû mane û ew nizane ka dê kengî van jinan derxin îfadeyê. AMED - ŞÛJIN**



## Girtîgeha Girtî ya Wanê veguheriye îşkencexaneyê

**LI GIRTÎGEHÊN Kurdistan û Tirkiyeyê zext û binpêkirina mafên girtiyên siyasî di asta herî jor de ye. Girtîgehên ji aliyê AKP'ê ve têne birêvebirin bûne cihê îşkence û tacîzê. Girtiyê siyasî yê bi navê Adem Er nameyek ji Komeleya Mafên Mirovan a Wanê (ÎHD) re şand û diyar kir ku gardiyan bi rengekî bi rêk û pêk li girtiyên siyasî yên li Girtîgeha Girtî ya Wanê, îşkenceyê pêk tînin.**

**Er anî ziman ku gardiyan bi hinceta 'dê lêgerînê bikin' dikevin odeyên wan û hemû alavên wan desteser dikin. Er da xuyakirin ku dema gardiyan dikevin odeyên wan, li wan didin û wiha got: "Saetên me yên destan ji me girtin, rojname û kovaran nadin me. Ji ber ku Girtîgeha Girtî ya Wanê nû ye ev der gelekî sar e. Em bang li cihên peywirdar dikin ku bikevin dewreyê." WAN - ANF**



## Kasibkaran jiyana xwe ji dest da

Piştî barîna berfa zêde ya li rojhilatê Kurdistanê û sînorê di navbera Başûr û Rojhilat de, ji ber aşûtê 3 kasibkaran jiyana xwe ji dest dabû û bi heman sedemê kasibkarekî din jî jiyana xwe ji dest da. Malpera Kurdpa di nûçeyeke xwe de ragihand ku kasibkarekî din ê kurd ku ji ber ku di bin aşûtê de mabû, birîndar bûbû, li nexweşxaneya dihat dermankirin jiyana xwe ji dest da.

Hat ragihandin ku navê kasibkarê jiyana xwe ji dest dayî Hûşyar e û welatiyê ji bajarê Mehabada rojhilatê Kurdistanê ye. Li gorî agahiyan du kasibkarên din ên di aşûtê de birîndar bûbûn, yên bi navê Mehmûd Xidir (31) û Hêdî Zahîr (24) li nexweşxaneyê di bin çavdêriya doktoran de ne.

Her wiha der barê bûyerê de Komeleya Civaka Demokratîk û Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KODAR) peyamek nivîskî weşand, ji bo gelê rojhilatê Kurdistanê û malbatên kasibkaran ên ji bajarê Serdeştê sersaxî xwest.

Daxuyaniya nivîskî ya KODAR'ê wiha ye: "Kasibkarên Kurdistanê îradeya kesayetek ku xwe radest û teslîm nekiriye nîşan didin. Bi canê xwe parastina rûmet û şerefa xwe û civaka xwe dikin. Em ji malbatên kasibkaran û rojhilatê Kurdistanê re sersaxiyê dixwazin." *SILÊMANÎ - ROJNEWS*

## Parka ku çêkir xira kir

**Li navçeya Cizîr a Şirnexê Parka Cumhuriyetê ku li navenda bajêr e û her demsala havînê dibû parêzgeha welatiyên navçeyê ji aliyê qeyûm ve hat xirakirin. Piştî qedexeya 14'ê kanûna 2016'an hêzên dewletê ev park dagir kir û destûr nedihat dayîn ku gel bikeve parkê.**

**Dema ku park hat xirakirin bi carekê wesayîtên kar ketin hundirê parkê û tevî darên bi salan e hatine çandin, hemû dar ji kokê ve rakirin. Darên hatin rakirin bi kamyonan derxistin.**

**Hate zanîn ku di projeya hatiye amadekirin de dê cihê parkê hemû bi kamerayên mobeseyan werin danîn. Parka Cumhuriyetê ku ji aliyê qeyûm Ahmet Adanur ve hat xerakirin ji aliyê qeyûmê 1999'an qeymeqam Suleyman Yildirim ve hatibû çêkirin û di nava 4 salan de tekane xebata Yildirim a tê zanîn, çêkirina vê parkê ye. ŞIRNEX - DÎHABER**

www.arsivakurdi.org

## Li Madagaskarê TIR qelibî: 47 mirî

**LI HERÊMA** Anjozorobeyê ya ku dikeve bakurê rojhilatê Antananarivoya Madagaskarê TIR'eke ku di qaseya wê de rêwî hebûn qelibî. Hat ragihandin ku TIR qelibiye nav rûbarê bi navê Mananara û zêdetirî 47 rêwiyên di TIR'ê de jiyana xwe ji dest daye û hejmareke zêde rêwî jî birîndar bûne. Rayedarekî Madagaskarê der barê qezayê de axivî û diyar kir ku TIR li ser pirekî qelibiye rûbar û pir ji derbasbûna TIR'an re qedexe bûye. Rayedar ragihand ku xebatên lêgerîn û rizgarkirinê hatine destpêkirin û guman heye ku hejmara kesên jiyana xwe ji dest bidin zêde bibe. Her wiha şahidê bûyerê jî diyar kir ku kesên di TIR'ê de ji dawetekê vegeriyane û ji ber leza zêde TIR qelibiye rûbarê Mananarayê. **ANTANANARIVOYA**



# Biryara Trump tê şermezarkirin

**Biryarnameya Trump a astengkirina ketina welatiyên welatên misilman a Amerîkayê li seranserê cîhanê hat şermezarkirin. Trump biryarnameya xwe parast û got ku dê ewlehiya sînoran bibe sedema şerê cîhanê**



Bertekên li hemberî biryara serokê Amerîkayê Donald Trump a qedexekirina welatiyên welatên misilman a ku beriya du rojan ji aliyê Dadgeha Federal a New Yorkê ve hat rawestandin, zêde dibin. Biryara Trump ji aliyê rayedarên dewletên muxatab û bi hezaran welatî û dozgerên parêzgehên Amerîkayê ve hat şermezarkirin.

Piştî ku Îranê bertek nîşanî biryara Trump da û ketina welatiyên Amerîkayê ya Îranê qedexe kir, Iraqê jî ketina welatiyên Amerîkayê ya Iraqê ji bo 90 rojan qedexe kir. Serokê Tevgera Sadr a şîeyên Iraqê Muqteda El Sadr jî daxuyaniyek da û bertekeke tund nîşanî Trump da. Sadr di daxuyaniya xwe de bal kişand ser dagirkeriya Amerîkayê ya li ser Iraqê û got kuTrump bila pêşî hemwelatiyên xwe yên ji Iraqê vekişîne.

Şîrketa qehweyê ya amerîkî Starbucksê jî der barê biryara Trump de daxuyaniyek weşand û bertekeke tund nîşanî Trump da. Şîrketê di daxuyaniya xwe de destnîşan kir ku ew biryara Trump qebûl nakin û ji ber vê yekê biryar daye ku di nav 5 salan de li 75 welatan 10 hezar penaberan bigirin kar.

**DADGEH QEBÛL NAKIN**

Li aliyê din dadgehên ku piştî Dadgeha Federal a New Yorkê biryara Trump da rawestandin derketin 5'an. Biryara Trump ji aliyê dadgehên federal ên California, Virgina, Washington û Massachusettsê ve jî hatin rawestandin. Serdozgerên 16 parêzgehên Amerîkayê jî biryara Trump şermezar kir û dan zanîn ku azadiya olî ji bo wan hêmana sereke ye û tu serok nikarin vê rastiyê biguherînin.

Parêzgehên ku biryara Trump şermezar kiriye wiha ne: New York, Washington D.C. , California, Pennsylvania, Massachusetts, Hawaii, Virginia, Oregon, Connecticut, Vermont, Illinois, New Mexico, Lowa, Maine, Maryland û Washington. Her wiha li seranserê Amerîkayê jî biryara Trump ji aliyê bi hezaran kesî ve bi xwepêşandanan hat şermezarkirin. ***AMED***



## Dê bibe sedama şerê cîhanê

**SEROKÊ AMERÎKAYÊ** Donald Trump bertek û nerazîbûnên der barê biryara xwe de li ber çavan negirt û li ser hesabê xwe yê Twitterê bertek nîşanî derdorên ku nerazîbûn nîşanî biryara wî din da û bi awayekî sosret biryara xwe parast. Trump da zanîn ku li Rojhilata Navîn gelek xiristiyan hatine înfazkirin û ji ber vê yekê nabe ku ew destûrê bidin ev wehşet berdewam bike. Trump di berdewamê de got ku dibe penaberiya neqanûnî û îxlalkirina ewlehiya sînoran bibe sedema şerê cîhanê yê sêyemîn.

## Ji bo herêmên ewle li hev kirin



**SEROKÊ AMERÎKAYÊ** Donald Trump ê ku ji ber biryarnameya betalkirina vîzeyên welatiyên welatên misilman di rojevê de ye û qralê Erebistana Siûdî Selman Bîn Abdulazîz bi rêya telefonê axivîn û di mijara 'herêmên ewle' de li hev kir. Qesra Spî der barê hevdîtina Trump û qral Selman de daxuyaniyek da û ragihand ku Trump ji Selman daxwaz kiriye ku li Yemen û Sûriyeyê piştgiriya herêmên ewle bike û qral jî ev yek qebûl kiriye.


Di berdewamiya daxuyaniyê de hat ragihandin ku Trump û qral Selman peymana nûkleerî ya Îranê û çalakiyên wê yên ku aramiya herêmê têk dibin jî nîqaş kirine. Her wiha hat ragihandin ku Trump û qral Selman mijara rêxistina Birayên Misilman jî bi hev re nîqaş kiriye û biryar daye ku li dijî rêxistina Birayên Misilman têkoşîneke hevpar bê dayîn.

Li aliyê din Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov jî der barê daxuyaniya Trump a 'herêma ewle' de axivî û destnîşan kir ku ji bo çêkirina herêmên ewle ku penaberên sûriyeyî xwe di ewlehiyê de bibînin, divê pêşî bi hikumeta Sûriyeyê re li hev bikin. **AMED**

## Hamon bû namzetê çepgiran

Di tûra duyemîn a pêşhilbijartina partiyên çepgir ên serokomariya Fransayê de wezîrê berê yê perwerdeyê Beoit Hamon, li hemberî serokwezîrê berê Manuel Valls bi ser ket û bi awayekî fermî bû namzetê çepgiran. Di vê tûrê de ji tûra yekem zêdetir deng hatin bikaranîn û Hamon ji sedî 58,65'ê dengan bi dest xistin. Hevrikê Hamon serokwezîrê berê Valls jî ji sedî 41,35'ê dengan bi dest xistin û têk çû.

Li gel serkeftina Hamon a pêşhilbjartinê jî, erkeke giran li pêşiyê ye ku hemû hilbijêrên çepgir bîne gel hev. Ji ber namzetiya Jean Luc Melenchon ê ku partiyên çepgir ên muxalîf û komunîst piştgiriyê didinê û Emmanuel Macron ê ku bêhtir polîtîkayên lîberal diparêze, di nav hilbijêrên çepgir de rê li ber dabeşiyeke mezin vedike. ***PARÎS***



## Serçeteyekî DAIŞ'ê hat kuştin



Berpirsyarekî çeteyên DAIŞ'ê ku bi jêkirina serê mirovan dihat nasîn, li Mûsilê dan ber kêran û hat kuştin. Hat ragihandin ku komeke çekdar ku nasnameya wan nayê zanîn, berpirsyarê çeteyên DAIŞ'ê yê bi navê Ebû Seyaf, li rojavayê Musilê daye ber kêran û ew bi derbên kêran kuştine. Li gorî agahiyên ku hatin bidestxistin çete Ebû Seyaf, ji ber ku li gorî wan tev negeriyane, zêdetirî 100 kesî bi awayekî hovane serên wan jê kirine û li herêma El Xesfeyê ya Mûsilê di kortekî de bi cih kirine. **MÛSIL**

## Li dijî mizgeftê êrîşa terorê



Li paytexta parêzgeha Quebec Quebec Cityê ya Kanadayê, li Navenda Çanda Îslamê ya Quebec City ku wek mizgeft jî tê bikaranîn, di dema nimêja eşayê de êrîşeke çekdarî pêk hat. Hat ragihandin ku êrîş ji aliyê 3 kesên çekdar ve pêk hatiye û 6 kesan jiyana xwe ji dest daye û gelek kes jî birîndar bûne. Piştî êrîşê çend kesên gumanbar ji aliyê polîsan ve hatin binçavkirin û der barê êrîşê de lêpirsîn hat destpêkirin.

Serokwezîrê Kanadayê Justin Trudeau yê ku êrîş wek êrîşeke terorê bi nav kir, li ser hesabê xwe yê Twitterê peyamek weşand û ji malbatên kesên ku di êrîşê de jiyana xwe ji dest daye re sersaxî xwest. ***TORONTO***

ROJEVA Medya
31 Çile 2017 Sêşem

## 'Rewşa Sûriyeyê ji asoya çareseriyê dûr e'



Endama Koordînesyona Kongreya Star Henîfe Hisên di gotara xwe ya dawî de destnîşan kir ku her çiqasî nunerên wan tev li civîna Moskovê bibin jî, ew di hêla projeya xwe de tu pêngava paşve neavêjin.

Henîfe Hisên di gotara xwe ya rojnameya Yenî Ozgur Polîtîkayê ya bi ser navê 'Hîn jî asoya çareseriyê dûr e' de anî ziman ku li Sûriyeyê qewimînên girînge hene lê ji ber berjewendiyên hin hêzên cihanî, asoya çareseriyê weke çirûskekî jî diyar nake.

**ÇIRAVA SIYASÎ**

Di berdewamê de Henîfe Hisên diyar kir ku bi serkeftinên HSD'ê yên bi koordîneya hêzên koalîsyonê xuya dibe ku dê di demên pêş de DYA li Sûriyeyê bibe tekane hêza ku xwedî gotinên çareseriyê û ev tespît kir: "Li dijî vê jî Tirkiye ya dagirker û Rûsyayê li hev kir. Li gorî vê yekê Heleb dan Rûsyayê û Bab jî firotin Tirkiyeyê… Bi vê yekê Tirkiye kişandin nav çiraveke siyasî û leşkerî."

**TIRKIYE PÊLÎSTOK E**

Henîfe Hisên di nirxandina xwe de got ku bi vê planê Tirkiyeyê jî mîna Qeter û Erebîstana Siûdî ji derveyî hewldanên çareseriyê dûrxistin û wiha dom dike: "Dê heta ku civîna Cenevreyê nîqaşên bêencam ên Astanayê bidomînin û di civîna Cenevreyê de jî jê re bibêjin 'Va ye tu bi ser neketî' û dê bê beralîkirin!"

**ARMANCA SÛRIYEYÊ**

Di dawiya gotara xw de jî Henîfe Hisên van nirxandinan dike: "Piştî civîna Astanayê Rûsyayê reşnivîsa makezagona Sûriyeyê ragihand û tê de xalên baş jî hebûn. Bi vê yekê Tirkiye dîn û har bû. Ji bo civîna Moskovê jî ne nûnerên rêveberiya xweser û federaliyê, tenê yên PYD'ê vexwendin. Ev jî dide xuyakirin ku ev hemle tenê ji bo tehrîkirina Tirkiyeyê bû û projeya me paşguh dikin. Tevî hemû hevdîtinan jî em ji projeya xwe paşde gav navêjîn. Ew kurdên çûn Astanayê û YPG û PYD reş dikir jî tenê dikarin nûnertiya MÎT a tirkan bikin." *AMED*


# Di belgeyên DAIŞ'ê de serçeteyên tirk

**Di kampa perwerdeyê ya çeteyên DAIŞ'ê ya li Caber Rojava de şervanên odeya çalakiyan gelek belge bi dest xistin. Di van belgeyan de diyar bû ku serçeteyên ku di rêveberiya kampê de cih digirt ji Tirkiyeyê ne**

NÛRHAN EBDÎ / REQQA - ANHA

Şervanên Xezeba Firatê kampa perwerdeya çeteyên DAIŞ'ê dîtin û li gorî belgeyên ketî destê şervanan de serçeteyekî tirk ew kamp birêve di bir.

Di çarçoveya hemleya Xezeba Firatê de şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê li gundê Caber Rojava yê ku di 28'ê kanûna 2016'an de ji çeteyên DAIŞ'ê hatibû rizgarkirin, kampeke perwerdeyê ya çeteyên DAIŞ'ê dîtin.




**CIHÊ KAMPÊ**

Hat zanîn ku komên çete yên DAIŞ'ê ji bo xwe ji êrîşên balafiran biparêzin û cihê wan ê perwerdeyê neyê zanîn, kampa xwe ya perwerdeyê di nava daristanan de çêkirine û ji 30 konan pêk tê. Li gorî belgeyên ku ketine destê şervanan de çeteyên perwerde dîtine temenê wan di navbera 15-30 salî de ye. Her wiha ji belegeyan de tê dîtin ku serçeteyê ku kampa perwerdeyê birêve di bir û çete perwerde dikirin jî ji Tirkiyeyê ye.

**BERMAHIYA ÇETEYAN**

Şervanan dan zanîn ku çeteyên ku nû tevli koma çete dibûn, li vê kampê di aliyê fikrî û leşkerî de dihatin perwerde kirin. Çeteyên DAIŞ'ê ji kampê reviyabûn û li pey xwe pirtûkên xwe yên olî û cebilxaneya xwe hiştibûn.

# Bi afirîneriya xwe debara malbatê dike







ROZANA DAWÛD / EFRÎN - ANHA

Welatiya bi navê Emîne Mihemed li gel malbata xwe bi dehan salan berê di koçberiyê de hînî rêsandina cilan dibe. Emînê Mihemed a ku demek şûnde êdî bûye pispora rêsandina cilan, niha debara malbata xwe bi vî karî dike.

Emîne Mihemed (30) ji nişecihên Kêla yê Raco ya Efrênê ye. Beriya dehan salan Emîne û malbata xwe bi armanca peydakirina derfetên jiyanî ji gundê xwe koç dibin û diçin Helebê. Di dema vê koçberiyê de jî Emîne Mihemed hînî rêsandina cilan bû. Bi destpêkirina aloziya Sûriyeyê re jî 5 sal berê vedigere gundê xwe.

**KEDEKE MEZIN**

Bi armanca afirandina derfetên jiyanî jî Emîne Mihemed karê xwe yê rêsandina cilan didomîne û bi vê yekê bi taybet jî di zivistanê de ji zarok û jinan re cil û bergan di rêse. Dayika Emînê dide zanîn ku wê ev sal nêzî 80 parçeyan ku çêkirine bi buhayeke erzan firotiye şêniyên gund. Dayika Emîne di bêje ku piştî ku daxwaza gel zêde bûyî, wê ji xwe re makîneyek kiriye û karê xwe niha bi makîneyê didomîne.

**ÇAVKANIYA JIYANÊ**

Dayika Emînê got ku şêniyên gund kîjan reng û bi awayî bixwazin li gorî wê rîs ji wê re tînin û ew jî li gorî daxwaza gel ji wan re cil û bergan di rêse. Dayika Emînê da zanîn ku ew bi vî karê xwe debara xwe dike.

# Minbic dibe mînaka biratiya gelan

ŞÎLAN MIHEMED / MINBIC - ANHA

Endamên Meclisa Sivîl a Minbicê ku ji hemû pêkhateyan pêk tên destnîşankirin ku meclisa sivîl dê ji bo biratiya gelan bibe mînaka herî berbiçav.

Meclisa Sivîl a Minbicê çend roj berê di encama civînekê de biryara berfirehkirina meclisê da bû. Di vê çarçoveyê de hejmara endamên meclisê ku ji 43'an pêk dihat bilind kir û kirin 132 endam. Der barê mijarê endamê meclisê yê bi navê Mihemed Mazin Tewfiq anî ziman ku hemû pêkhate di nava meclisê de cih digirin û ew bi vê yekê gelek kêfxweşin.

Endamê çerkez ê bi navê Muhend Hebaq jî da zanîn ku meclisa sivîl xizmeta welat û welatiyan dike û tevî cih girtina hemû pêkhateyan di meclisê de her wiha mafê jin û ciwanan jî tê parastin. Hebaq ev yek jî weke bingeha şoreşê bi nav kir. Endamê meclisê Ekrem Xazî Dada jî berfirehkirina meclisê weke gavekî erênî pênase kir û daxuyand ku ev pêngav dê li tevahiya Sûriyeyê bibe mînak.

Têkildarî mijarê de endamên bi navên Ibrahîm Cedan û Ebdo Mustefa jî bilêv kirin ku hemû pêkhate bê cudahî di nava meclisê de cih digirin û gotin ku ev jî ji bo xurtkirina biratiya gelan pêngaveke pêwîst bû. Endaman gotin ku bi vê yekê dê hemû pêkhate bi rola xwe rabin.



## Hêzên rejîmê 11 km'yan nêzî Babê bûn

Pêşveçûna hêzên rejîmê ya ber bi bajarê ve didome. Hat zanîn ku bi pêşveçûnên dawî yên hêzên rejîmê re di navbera hêzên rejîmê û bajarê Babê de tenê 11 km ma ye.

Bi armanca standina herêma Babê ji komên çete yên DAIŞ'ê, hêzên rejîma Sûriyeyê ji hêla Helebê ber bi Babê ve hemleyeke nû da destpêkirin. Di vê çarçoveyê de hêzên rejîmê gelek gund ji çeteyên DAIŞ'ê standin. Hat zanîn ku hêzên rejîmê herî dawî jî gundê El Medyone û girê El Mişêrfe ku dikeve başûrê rojavayê Babê xist bin serweriya xwe.

Li gorî agahiyên ji herêmê, hêzên rejîmê gundên Eyn El Cihaş, El Birêc û El Şêx ên dikevin başûrê bajarê Babê jî xistin bin kontrola xwe. Di navbera gundên navborî ku rejîma Sûriyeyê kontrol kirin û navenda bajarê Babê de tenê 11 km ma ye. Hêjayî bibîrxistinê ye ku hêzên dewletê di demên dawî de ji herêma Deriye û Xan Hefîre ku 16 km'yan dikeve başûrê rojavayê Babê ji çeteyan standin. **BAB - ANHA**

## Li Dêra Zorê 7 sivîl hatin qetilkirin

Şer û pevçûnên di navbera hêzên rejîmê û komên çete yên DAIŞ'ê yê li bajarê Dêra Zorê her ku diçe mezintir dibe. Li gorî agahiyên ji bajêr, di encama bombebarana balafirên şer de 7 sivîl hatine qetilkirin.

Li gorî agahiyên ji herêmê, li taxên Karkeran, Resafa û herêma goristanê yên Dêra Zorê şerê di navbera hêzên rejîmê û komên çete yên DAIŞ'ê de mezin bûye. Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyeyê da zanîn ku di encama bombebaran hêzên artêşa Rusiyayê de 7 sivîl hatine qetilkirin.

Her wiha li bejahiya rojhilatê Humsê jî hêzên rejîma Sûriyeyê derdora Arak û Qeser El Heyer topbaran kir. Hat zanîn ku li derdora stasyona çaran û Ceb El Cerah de jî di navbera çeteyên DAIŞ'ê û hêzên rejîmê de şer derket. Çavkaniyên ji herêmê dan zanîn ku ji herdu aliyan jî kuştî û birîndar hene. **QAMIŞLO - ANHA**



## Vekirina nûneriyên rêveberiya xweser girîng e

Nûnerê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ê Rusyayê Rodî Osman serdana navenda rêveberiyê ya Kantona Cizîrê ya li Amûdê, kir. Osman ji aliyê serokê meclisa rêveber ê kantonê Ebdulkerîm Sarûxan, cîgirê wî Hisên Ezam, şêwirmendê rêveberiya xweser Bedran Çiya Kurd û hevserokê desteya derve Ebdulkerîm Omer ve hat pêşwazîkirin. Civîn ji çapemeniyê girtî pêk hat. Ebddulkerîm Sarûxan têkildarî civînê de axivî û destnîşan kir ku xebatên nûnertiyê yên li Rûsyayê hatine nirxandin. Sarûxan da zanîn ku avakirina nûnertiyên rêveberiyên xweser, ji bo danasîna şoreşa Rojava pir girînge. **AMÛDÊ**

## Minbicî bi neçarî cilên hatin bikaranîn li xwe dikin

Ji ber amborgeya li ser herêmên bakurê Sûriyeyê wekî gelek tiştan, buhayê cil û bergan jî pir buha bûye. Welatiyên Minbicê ên ku ji ber buhabûnê nikarin pêdiviyên xwe yên lixwekirinê pêşwazî bikin, bi neçarî cilên ku hatine bikaranîn û li dikanan tên firotin, dikirin. Der barê mijarê dikandarê cilan ê bi navê Mihemed Hemed da zanîn ku ji ber kêmbûna kar li herêmê gelek kes karê cilfirotinê dike û da zanîn ku ji ber erzanbûnê jî gelemperiya gel cilên hatine bikaranîn dikire. Rojane bi sedan welatiyên ji Kobanê, Girê Spî û herêmên din tên Minbicê û pêdiviyên xwe pêşwazî dikin. **MINBIC**

www.arsivakurdi.org

# Li dijî faşîzmê yekitî

**Endamê Konseya Rêveber a PKK'ê Murat Karayilan destnîşan kir ku li Tirkiyeyê hemû kesên li dijî faşîzmê, divê yekitiya xwe ava bikin û wiha got: "Ger ev pêla faşîst bi ser bikeve, Tirkiye dê bi salan di nava tariyê de bigevize."**

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Murat Karayilan beşdarî bernameyeke taybet a Radyoya Dengê Kurdistanê bû mijarên ku di rojevê de ne nirxand.

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Karayilan gefa Wezîrê Karên Hundir ê Tirk Suleyman Soylu ku digot, 'Wê heta meha adarê kes nikaribe qala PKK'ê bike' bibîr xist û got, "Kêm ma ye em bikevin meha Adarê. Heta niha di vê plansaziya xwe de ti serketinek bi dest nexistine û planên wan têk çûye."

Karayilan balkişand têkçûna dewleta tirk a li Babê û da zanîn ku dewleta tirk hejmara leşkerên ku hatine kuştin vedişêre, 158 roj in nikarin bikeve Babê û hemû cîhanê asta şer a dewleta tirk dît. Karayilan destnîşan kir, ku ger ji Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) re bihata hiştin, wê HSD'ê di nava hefteyekê de ev herêm rizgar bikira.


Karayilan anî ziman ku divê gelê kurd li hemberî zilmê birêxistinbûna xwe xurttir bike û divê tifaqa xwe pêk bîne. Karayilan da zanîn ku li başûrê Kurdistanê planên Tirkiyeyê bi ser neketine û wiha got: "Em dikarin bibêjin, li başûrê Kurdistanê jî bi ser neketine. Wan xwestin li Şengalê şer bikin û bi vê wesîleyê di navbera hêzên kurdan de şer derxînin. Ango xwestin PDK'ê bikişînin nava şer, lê bi ser neketin. Tevî vê yekê xwestin pêngaveke dîplomatîk bikin, heyeteke berfireh şandin Bexdayê. Xuya ye ji wir jî encamek bi dest nexistine."

Karayilan destnîşan kir ku banga KCK'ê ya ji bo yekîtiya neteweyî bandoreke mezin kiriye û wiha got: " Di mijara yekitiya neteweyî de, pêkane ku hin tiştên cuda rû bidin. Di vê mijarê de hewldaneke cidî heye. Têkoşîna Azadiyê ya Kurd di serdemeke gelekî girîng re derbas dibe. Derfetên gelê kurd çêbûne ji bo azad bibin. Lê belê ji bo kurd mîna cîranên xwe li ser axa xwe ya pîroz bi rengekî azad bijîn, lazim e vê derfetê baş bi kar bîne û li ser bingeha meşa azadiyê, yekitiyeke siyasî, dîplomatîk, neteweyî û leşkerî ava bikin. Weke PKK em bi çavekî stratejîk li vê mijarê dinêrin."

**ÇARE YEKITÎ YE**

Murat Karayilan destnîşan kir ku li dijî pêla faşîst a li Tirkyeyê divê her kes yekîtiya xwe ava bikin û got, "Ger pêşî li vê pêlê were girtin, wê Tirkiye ronî û aram bibe. ger ev pêl bi ser bikeve, wê Tirkiye di nava salên dûr û dirêj de di nava vê tarîtiyê de bigevize. Di vê mijarê de Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê bi roleke gelekî girîng radibe. Ji ber ku Erdogan her kes melisandiye. Niha hêza bingehîn a li ber êrîşên faşîst ên Erdogan, AKP û MHP'ê radibe, Têkoşîna Azadiyê ya Kurdistanê ye."

***BEHDÎNAN –ANF***



## Di 9 xalan de dijminahiya kurdan

**MURAT KARAYILAN** da xuyakirin ku rejîma AKP'ê di rewşa heyî de biryar li ser konsepteke nû daye û di çarçoveya vê konseptê de xeta MHP'ê daniye pêşiya xwe. Karayilan diyar kir ku naveroka vê konseptê dijminatiya li kurdan e. Karayilan ev plana navborî bi 9 xalan rave kir:

1 – Tecrîda li ser Rêber Apo şidandin û bi siyaseta îşkence û şerê psîkolojîk xwestin li Îmraliyê encamekê bi dest bixin.
2 – Hemû saziyên kurdan girtin û êrîşî destketiyên gelê kurd kirin. 390 saziyên kurd bi carekê ve girtin.
3 – Plan kirin ku dest deynin ser sed şaredariyên di destê siyaseta kurd de ne. Ji bo bertek neyê nîşandan her carê dest datîne ser 2 – 3 şaredariyan.
4 – Siyaseta kurd a demokratîk kir hedef û xwest kurdan li derveyî qada siyasetê bihêle. Ji bo vê jî Hevserokên HDP'ê û 11 parlamenter girtin û di demên dawîde 4 hezar kes binçav kirin.
5 – Zextên li ser gel zêde kirin. Şerê taybet – psîkolojîk dimeşînin û rewşa awarte timî dirêj dikin.
6 – Hewl didin ciwanên kurd ji rê derxînin.
7 – Operasyonên berfireh di rewşa heyî de li dijî gerîlayên azadiya Kurdistanê dimeşînin.
8 – Êrîşî dostên gelê kurd dikin.
9 – Ji bo dengekî bi tenê derkeve, gelek organên çapemenî – weşanê girtin.

## Li Îmraliyê berxwedana vîna azad

**KARAYILAN** Kompleya 15'ê Sibatê û hemû hêzên di nav de cih girtine şermezar kir û diyar kir ku 18 sal in li Îmraliyê zilmeke mezin heye û Ocalan li dijî vê zilmê sekna mirovekî azad ê rasteqîn nîşan dide û wiha got: ""Ev sekn, sekneke awarte ye. Tevî hemû êrîşan jî Rêber Apo ev 18 sal in vîna xwe ya azad û serbixwe parastiye. Ev titşekî gelekî mezin û watedar e."

# Darizandina wan li dijî qanûnan e

Parlamenterê HDP'ê yê Wanê Nadir Yildirim ku di çarçoveya "Doza KCK'ê ya Sereke" ya 154 siyasetmedarên kurd tên darizandin de dihat darizandin, serê sibê li avahiya Edliya Amedê dema doza Serokwekîlê Koma HDP'ê Îdrîs Baluken dişopand hat binçavkirin.

Yildirim ku der barê wî de biryara "Bi zorê bînin" hatibû dayîn piştî hat binçavkirin sewqî dadgehê hat kirin. Yildirim piştî li Dadgehê ji îfadeya Doza KCK'ê ya Sereke îfade da serbest hat berdan. Yildirim ku berê ji doza KCK'ê 5 salan girtî ma û serbest hatibûberdan, der barê wî de biryara bi zorê bînin dadgehê hatibû dayîn. Yildirim piştî hat binçavkirin birin beşdarî rûniştina "Doza KCK'ê ya Sereke" ku li 2'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin kirin. Yildirim ku bi zorê beşdarî dozê kirin bi kurdî îfade da. Yildirim, diyar kir ku sedema netevlêbûna wî ya dadgehê helwesta li dijî heyeta dadgehê ye û wiha got: "Ez berê ji vê dozê 5 salan hatim girtin û hatim berdan. Destnedayîna min bi awayekî keyfî hat rakirin. Darizandin û darazê di dîroka Tirkiye de heta niha biryarek wisa nedaye. Destnedayîna me li djî biryara Dadgeha Makeqanûnê ye." Heyetê doz taloqî 1'ê sibatê kir.

***AMED***




## Ahmet Turk dîsa birin Stenbolê

**MÊRDÎN** – Hevşaredarê Bajarê Mezin ê Mêrdînê ku di 24'ê mijdarê de hatibû girtin ji Stenbolê anîbûn Xerpêtê. Hate hînbûn Turk ê ku nexweşiya dil pêre heye ji bo nexweşiya wî birin Saziya Tipa Edlî ya Stenbol. Her wiha piştî dermankirina li Saziya Tipa Edlî ya Stenbolê dîsa Turk birin Xerpêtê.



## Ji bo Pîr biryara 'bi zorê anîn' ê

**AMED** – Rûniştina Doza Parlamenterê HDP'ê yê Amedê Ziya Pir ku 33 sal ceza jê re tê xwestin, li 8'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin. Parlamenter Pîr beşdarî nûniştinê nebû. Heyeta dadgehê der barê Pir de biryara bi zorê bînin rûniştina dozê da û rûniştin taloqî meha adarê kir.



## Hevşaredar Ozturk hat girtin

**AGIRÎ** – Li hemberî şaredariyên DBP'ê operasyonên dewleta AKP'ê dewam dikin. AKP li aliyekî bi tayînkirina qeyûman şaredariyan desteser dike û li aliyê din jî hevşaredarên DBP'ê dide girtin. Hevşaredarê Dutaxê Firat Ozturk ku hatibû binçavkirin, bi îdîaya 'Endamtiya rêxistinê ye" hat girtin.



## Îdrîs Baluken hat berdan

**AMED** – Rûniştina Doza Parlamenterê HDP'ê yê Amedê û Endamê Heyeta Îmraliyê Îdris Baluken li 8'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin. Baluken ku ji ber axaftinek di civîneneke KCD'ê de kiribû, dihat darizandin, ji aliyê dadgehê ve serbest hat berdan.



## Agir bi Salona Yilmaz Guney ket

**ÊLIH** – Agir bi Salona Sînemayê ya Yilmaz Guney a Êlihê ket. Ji ber sedemeke ne diyar agir bi Salona Sînemayê ya Yilmaz Guney a girêdayî şaredariya Êlihê ku beriya niha ji aliyê AKP'ê ve radestî qeyûm hatibû kirin, ket. Hat ragihandin ku beşeke mezin a salonê şewitiye û nikare bê bikaranîn.



www.arsivakurd.org

# Li gelek welatan komplo tê şermezarkirin

Kurdistanî û dostên wan, bi armanca şermezarkirina komloya navneteweyî ya 15'ê Sibatê, dê li gelek welatan meşên dirêj û çalakiyan li dar bixin.

Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) diyar kir ku ji bo şermezarkirina komployê meşa dirêj sibê dest pê dike û wiha got: "Di meşa dirêj a navbera 1-15'ê Sibatê de gelê kurd û dostên wan wê bi şiyara 'Azadî ji Birêz Ocalan re, statu ji Kurdistanê re' bimeşin. Di navbera 1-15'ê Sibatê de wê li Elmanya, Swîsre, Fransa, Îngilîstan, Hollanda, Belçîka, Yewnanîstan, Kanada,




Awûstralya, Japonya, Danîmarka, Norwêc, Swêd, Romanya û Fînlandiyayê meşên dirêj û mîtîng bên lidarxisitn. Meşa dirêj a bi pêşengiya Ciwanên Azad di 5'ê Sibatê de dest pê bike, wê di 10'ê sibatê de bigihêje Strasboûrgê. Baskê Enternasyonal jî dê di 1'ê Sibatê li ber Dîwana Edaletê ya li Luksembûrgê dest bi meşê bike û roja 10'ê Sibatê bigihêje Strasboûrgê. Dostên Kurdan ên ji Spanya, Portekîz, Elmanya, Îngilîstan, Swêd, Îtalya, Belçîka, Fransa, Fînlandiya, Swîsre, Arjantîn û gelek welatên mîna van, wê tevlî vê meşê bibin." KCD-E bang li hemû kesî kir ku tevlî çalakiyan bibin.

Nobeda 'Ji Ocalan re Azadî', ku ji 25'ê Hezîrana 2012'an û vir ve li bajarê Strasboûrg ê Fransayê tê girtin, ji duh ve ji aliyê 4 endamên Federasyona Elewiyan a Demokratîk li Ewropayê (FEDA) ve tê girtin. **BRUKSEL - ANF**

## Li dijî serokdewletiyê ciwan hene!

Ciwanên ku li Edeneyê bi slogana "Li dijî serokdewletiyê ciwan hene" hatin cem hev, diyar kir ku ji bo rawestandina pêkutî, şîdet û xwînê dê ji serokdewletiyê re bibêjin 'Na'.


Ciwanên ku endamên Dev Guç, SGDF, SOH, YDG û Devrîmcî Yolda Devrîmcî Gençlikê ne sedemên ku çima hatine cem hev parve kirin. Endama SGDF'ê Aylîn Yildiz diyar kir ku wek ciwan ew li dijî ferzkirina serokdewletiyê bi slogana "Li dijî serokdewletiyê ciwan hane" hatine cem hev.



Yildiz anî ziman ku li dijî şer ji bo aştiyê ew ê li kalon û qadan bin bang li hemû ciwanan kir xwest li dijî serokdewletiyê dakevin qadan. Yildiz a nirxandina "Îro ev serokdewletî li dijî hemû bindestan tê ferzkirin" kir got ku ew jî wekî ciwan bi fikara pêşerojê slogana "Li dijî serokdewletiyê ciwan hene" pêx dixin.

**'NA'YÊ BI RÊXISTIN DIKIN**

Endamê Dev Guçê Nîhat Bayav jî diyar kir ku AK Partiyê rejîma serokdewletiyê di pêvajoya 7'ê Hezîranê de xistiye dewreyê, ji bo serokdewletiyê welat kiriye qada şer.



Bayav destnîşan kir ku ji bo ku ji dîktatoriyê de bibêjin na bi ciwanan re hatine cem hev û wiha got: "Em ji bo ku bombe neteqin, jin û zarok li kolanan neyên kuştin, dibistanên me azad bin li cem hev in. Heta referandûmê em ê li her derê li dibistanan, qadan, otobusan, vapuran, sûkê, bazarê li kû derê be ligel pêkutiyan 'Na'yê bi rêxistin bikin." **EDENE**



# Gelê Mêrdînê dibêje 'Na'

Şêniyên Mêrdînê têkildarî hilbijartina referandûmê diyar kir ku dê ji bo siyaseta demokratîk, parastina mafên mirovan û vîna xwe bibêjin "Na".

Şêniyên Mêrdîn têkildarî hilbijartina Referandumê biryara xwe aşkere kirin. Şêniyên Mêrdînê diyar kirin ku ew dê bi dengê hêl û berz bêjin "Na".

Hevserokê Rêxistina HDP'a Mêrdînê Ali Aslan, diyar kir ku AKP dixwaze projeya Osmaniyan a 200 sal berê ji nûve zindî bike û mafê her kesî ji destê wan bigire. Aslan, da zanîn ku partiya wan a siyaseta demokratîk dimeşîne dê bi awayekî xwezayî li dijî vê yekê derkeve û bêjin "Na"

**'JI ZILMÊ RE NA'**

Mamosteyê teqawît û niviskar Serkeft Botan jî bertek nîşanî pêşnûmayê da û diyar kir ku ew xwe di vê qanûna bingehîn de namînin û ji ber vê yekê dibêjin "Na" Botan, anî ziman ku rêveberiya yek mirovî dê krîzê bêtir kûr bike û bêtir mafên mirovan dê bê binpêkirin. Botan, bilêv kir ku dixwazin bi vê qanunê Dîktatoriya xwe bêtir xurt bikin û ew dê li dijî vê pergala dîktatoriyê bêjin "Na"

Welatiyê bi navê Davut Şahin jî anî ziman ku ew dê ji bo jiyanek demokratîk li dijî pergala Serokdewletiyê bêjin "Na". Şêniyê bi navê Ramazan Benlî jî anî ziman ku ji ber dê hemû erk û raye têkevin destê yek mirovî û vîna wan ji deste wan bê girtin dê di Referandûmê de bêjin "Na".

Welatî Cebrail Alkan jî destînaş kir ku ev pergal li dijî siysaeta demokratîk, mafên mirovan û hebûna wan darbe ye û ji ber vê yekê dê bi dengê bilind bêjin "Na". ***MÊRDÎN***



## Fazil Say jî got 'Na'

**HUNERMEND** û pîyanîstê navdar Fazil Say, diyar kir ku ew dê ji bo jiyaneke bîrûmet, pêşerojeke ronî û dostaniya gelan di referandûmê de bibêje "Na". Fazil Say di hesabê xwe yê medya civakî de wiha got: "Êm dê bêjin "Na" Ji bo em mirovên ku ji welatê xwe warê xwe hez dikin em dê bêjin "Na" Li dijî rejîma yek Mirov a li dervê demê emê bêjin "Na". Bê guman em Ataturkperver in. Ji bo pêşerojek ronak û jiyanek xweş û şaristanî em dê bêjin "Na". **STENBOL**

## Haşe

# Erdoganê piştî Astanayê



Fehîm Işık
isikfehim@gmail.com

Erdoganê çend hefte berê bînin bîra xwe. Di axaftinên xwe de hêza Tirkiyeyê welê mezin dikir ku qaşo dê di çend rojan de Babê bigirin û ji wê derê jî berê xwe bidin Minbicê. Heta Minbicê tu alîkarî ji Amerîkayê daxwaz nedikir, digot, "Em ê Babê jî bigirin, Minbicê jî." Lê piştî Minbicê hesabê ku dê bi piştgiriya Amerîkayê berê xwe bidin Reqqayê dikir. Te digot qey Sûriye mala bavê wî ye û dê bikare Sûriyeyê bi dilê xwe dîzayn bike.

Beriya civîna Astanayê rewş guherî. Heta wê demê çi kes li ber wan ranediwestiya. Heta li hin cihan bê şer gund û navçe dagir kirin. DAIŞ'ê, hin cih di tepsiya zêrîn de dan Tirkiyeyê. Lê li ber deriyên Babê, rawestiyan. Şer xurt bû. Şîrikên leşkerên tirk ango çeteyên qaşo Arteşa Azad, ji qadê reviyan. Leşkerên tirk û çeteyên DAIŞ'ê rû bi rû man. Li qadên şer 3 hezar leşkerên tirk hebûn. Hejmara leşkerên xwe zêde kirin, 5 hezarên din jî anîn herêmê. Dîsa têrê nekir. Nedikaribûn yek bihûstekê jî bi pêş ve biçin.

Di heyama astengiyê de hevkariya wan a bi Rûsyayê re gihaşt hawara wan. Heleb firotin, dan rûsan. Çeteyên xwe bi paş ve kişandin. Rejîma Suriyeyê, Heleb girt bin kontrola xwe. Di encamê de Lavrovê wezîrê derve yê Rusyayê aşkera kir û got ku "Ew ê Tirkiye û Sûriye li Astanayê werin ba hev."

Piştî gotinên Lavrov, rayedarên Tirkiyeyê careke din dest bi teqleyan kir. Diviyabû îzaha vê yekê bikin. Medyaya di bin kontrola hikumetê de ye dest bi kar bûn. Helwesta Tirkiyeyê wekî helwesteke însanî nîşan dan. Ji bilî HDP'ê partiyên li parlamentoyê jî bi helwestên xwe piştgiriya Erdogan û hikumetê kir. Bi gotinên kin û kurt, kaba Erdogan careke din lê hat. Li Tirkiyeyê kêm kes ji çewtiyên Erdogan bi hay bûn.

Lê li derve rewş ne ev e. Erdogan her ku diçe zêdetir dikeve astengiyê. Vê gavê xwe teslîmî Rûsyayê kiriye; lê diyar e dê teslîmî welatên rojava û Amerîkayê jî bibe. Ewil pêngava xwe piştî civîna Astanayê aşkera kir. Tirkiye êdî li Babê nikare bi pêş ve biçe. Dê Babê bidin Sûriyeyê. Welê dixuye, dê Îdlîbê jî teslîmî wan bikin. Heta ku mase safî bibe, dê tenê bi Cerablus, Azez û Mareyê ve mijûl bibin.

Di meseleya herêma ewle de jî rewş guherî. Trump behsa herêmên ewle kir, lê Tirkiye jê xweş nebû. Em dizanin, ewil car Tirkiye daxwaza herêmên ewle kiribû. Lê tiştên Trump bi lêv kirin, ne bi dilê rayedarên tirk in. Ew ditirsin ku bi plana herêmên ewle, dê parastina Rojava xurttir bibe û têkiliyên Amerîka û kurdên Rojava, bi taybet jî yên PYD'ê baş bibin.

Welê dixuye ku bi civîna Astanayê balona Tirkiyeyê careke din hewa jê çû. Lê ew balon ne ku tenê hewa jê diçe, divê bi carekê ve biteqe. Ji bo ew balon bi temamî biteqe, bê şik pêwîstî ji berê zêdetir bi hevkarî û yekdengiya kurdan heye.



# KNK'ê bang li medyaya kurd kir

KNK'ê bi daxuyaniyeke nivîskî bang li hemû sazî û dezgehên kurdî û qenalên televizyonê yên çar parçeyên Kurdistanê kir ku bernameya wan a bi mebesta Yekîtiya Netewî bi weşana zindî were dayin da ku li nav hemû kurdan mijara Yekitiya Netewî bibe rojev.

Di peyama KNK'ê de stranbêjên ku wê amade bibin wiha hatine rêzkirin: ''Najmadîn Ghoulamî, Naser Rezazî, Dîyar, Adnan Karîm, Şemdîn, Xelîl Xemgîn, Xana Zezê, Zozan, Hozan Comerd û Maher Hamadamîn.''

KNK'ê wiha got: "Ji bo pêşxistina yekitîya neteweyî di nav sîyaseta çar parçeyên Kurdistanê de em wek Kongra Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) karên xwe berdewam dikin. Di vê çerçovê de me stranbejên ji çar parçeyên Kurdistan dawet kirin ku di weşaneke zindî ya televîzyonên kurdî de li ser pewîstîya Yekitiya Neteweyî fikir û ramanên xwe bi raya gîştî ya Kurdistan re parve bikin. Em dixwazin ku di roja 2'yê Sibatê de mijara Yekitiya Neteweyî di hemû malên Kurdan de li Bakur, Rojhilat, Başûr, Rojava û derveyî welat bibe rojev. ***BRUKSEL - ANF***

ROJEVA Medya
31 Çile 2017 Sêşem



# 'Xwefiroş nûnertiya me nakin'

Êzidiyên Şengalê bertek nîşanî alîgirên PDK'ê dan û got ku yên gelê xwe firotin nikarin berxwedêrên Şengalê rexne bikin

Jinên êzidî yên li çiyayê Şengalê bertek nîşanî daxuyaniyên parlamentera PDK'ê Viyan Dexil û qeymeqam Miheme Xelîl da û diyar kir ku van kesan şexsiyetên xwe bi dolaran firotine.

Jinên êzidî da zanîn ku ev kesayet êrîşî hêzên wan ên parastinê dikin û ew jî vê yekê qebûl nakin.

Jinên êzidî yên ku li çiyayê Şengalê xwe bi rêxistin kiriye, nerazîbûnên xwe nîşanî daxuyaniyên Viyan Daxil, Miheme Xelîl û Şêx Şemo dan.

Endama Rêveberiya Tevgera Azadiya Jinên Êzidî Naem Îlyas destnîşan kir ku kesên ku axa xwe terikand tu mafê wan ê rexnekirina hêzên parastinê yên Şengalê tune ye û wiha domand: "Van kesan xwe bi dolaran firot. Tekane karê van kesan li ser TV'yan reşkirina hêzên parastinê ye. Kesên ku xwe firotiye, nikarin nûnertiya gelê êzidî bikin."



**ÇIMA REVIYAN?**


Naem Îlyas diyar kir ku bila ev kes têkildarî Şengalê neaxivin û wiha pê de çû: "Madem ew qas ji Şengalê hez dikin bila vegerin van çiyayan. Madem li berjewendiyên êzidiyan difikirin çima reviyan? PDK çawa dixwaze ew jî wisa tev digerin û van kesan baweriya xwe firot. Bila dev ji me û çiyayê me berdin. Em li ser ola xwe ne, li ser axa xwe ne."

**HÊZA PARASTINÊ**

Naem Îlyas got ku ew ê tu caran axa xwe neterikînin û wiha berdewam kir: "Ger bixwazin ji bo gelê xwe tiştekî bikin, bila vegerin nava gel. Mafê wan ê rexnekirina YBŞ/YJŞ'ê tune ye. Cara yêkem e hêza parastina êzidiyan çêbû. Lê ev kesên xwe firotiye bi zimanê xwe dixwazin vê hêzê qirêjî bikin. Em ê vê yekê qebûl nekin. Asayîşa PDK'ê ciwanên me digirin û îşkence dikin. Bi sedan ciwanên me girtî ne û ambargo danîne ser Şegalê. Çi ji me dixwazin? Vê carê em ê ji bo xwe her tiştî bikin. Bila werin berxwedana şervanên me di çeperan de bibînin. PKK'ê bi xwîna xwe Şengal rizgar kir û tu kes nikare bibêje ji Şengalê derkeve. Ji derveyî PKK'ê tu hêzekê ji bo êzidiyan tiştek nekir."


**YBŞ Û YJŞ FEDEKAR IN**

Endama Tevgera Azadiya Jinên Êzidî Leyla Mehmûd jî bi lêv kir ku tenê gelê êzidî dikare der barê jiyana xwe de biryarê bide û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Kesên wekî Viyan Daxîl, Miheme Xelîl û Şêx Şemo dînê xwe bi dolaran firotiye û îro jî derketine û li ser me diaxivin. Ew jî zarokên me bûn lê îro terka axa xwe kiriye. Ger xwedî li êzidîtiya xwe derkevin, bila tev li YBŞ'ê bibin û ji bo axa xwe şer bikin. Tenê YBŞ û YJŞ ji bo gelê xwe fedekariyeke mezin dike. Bila dev ji berjewendiyên partiyan berdin û werin ji bo êzidîtiya xwe bikin. Ger venegerin dê gelê êzidî wan nas neke û li rûyê wan nenihêre." *ŞENGAL - ŞÛJIN*



# Her zivistanekê bihara xwe heye

ALÎ KOÇER / AMED - ROJNEWS



Dîlan Yakut



Hasan Taşkiran



Yaşar Yigit

Endamên Îş-Kur'ê yên ku ji ber KHK'yan ji kar hatine derxistin da zanîn ku hikumeta AKP'ê hewldana darbeya 15'ê Tîrmehê wek firsendekê bi kar aniyê û bi vê yekê dixwaze hemû hêzên muxalîf biçewisîne.

Li Tirkiyeyê di çarçoveya Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de heta niha bi deh hezaran kes ji kar hatin dûrxistin. Herî dawî jî endamên Buroya Sendîkaya Kedkaran (BES) ji kar hatibûn dûrxistin. Der barê mijarê de hevseroka BES'ê ya şaxa Amedê Dîlan Yakut da zanîn ku hevserokê wan ê din Bedîrhan Çetînkaya girtî ye û wiha domand: "Di destpêkê de ji kar hat dûrxistin û piştre jî hate girtin. Li şaxa me 70 hevalên me ji kar hatin dûrxistin. Hejmara endamên me jî ji hezar û 300'an daket 700'an."

**ZEXT ZÊDE DIBIN**

Yakut da zanîn ku dewlet dixwaze hundirê sendîkayan vala bike û wiha pê de çû: "Bûyerên balkêş pêk tên. Mînak; karmendeke me ji ber ku bi personelên midûr re nîqaş kir, li gel 12 hevalên me yên din ji kar hatin dûrxistin. Ji ber rewşa awarte em nikarin xebatên xwe bimeşînin û xebatên me jî hêla amîrên saziyan ve tên astengkirin. Bi taybet midûrê bajêr yê Îş-kur'ê di vî alî de me pir tengav dike. Zexta îstîfayê li endamên me dike. Tenê li Amedê 71 kes ji kar dûr xistin. Ji bo vê me serlêdan li dadgeha îdarî kir û em ê piştre jî serî li DMME'yê bidin. Dê têkoşîna me ya li hemberî van pêkanînan bidome."

**KIRYARÊN BÊHIQÛQÎ**

Endamê BES'ê Hasan Taşkiran ê ku ji Îş-Kur'ê hat derxistin jî da zanîn ku hikumetê 15'ê Tîrmehê wek firsendekê bi kar aniye û ev tişt anîn ziman: "Li ser KESK û sendîkayên girêdayî wê zexteke mezin heye. Tevî ku der barê wan de tu lêpirsîn tune ne, Îş-Kur'ê 19 hevalên herî çalak ji kar derxistin. Dema em çûn kar, me dît ku saziya me hatiye dorpêçkirin. Em jî çûn û me alavên xwe kom dikirin. Hevalên ku ji kar nehatin avêtin gelekî diêşiyan û şerm dikir. Pişta xwe dan me û sendîka terk kirin."

**HÊVIYA WAN HEYE**

Di berdewamê de Taşkiran daxuyand ku der barê derxistina wan a ji kar de tu daxuyanî jî nehatine dayîn û wiha got: "Rêveberên bajêr, ên giştî û wezaret dibêjin 'me wihsa nekiriye'. Lê dibêjin ku li ser lingên midûriyeta polîsan, rêveberiya bajêr û tora civakî pêk hatiye. Balkêş e ku hevalên ji kar hatin dûrxistin, hesabên tora civakî jî nebûn. Me wekîltiya xwe ya îtîrazê daye parêzerên xwe. Em pêvajoyê dişopînin. Rêyekê zor e lê her zivistanekê bihara xwe heye. Bêguman em ê mafên xwe bi dest bixin."


**BÎLANÇOYA OHAL'Ê**

Endameke din ê BES'ê Yaşar Yîgît jî destnîşan kir ku hikumet bi KHK'yan hêzên muxalîf ditepisîne û wiha bi dawî kir: "Hemû kiryarên wan bê hiqûqî ne. Mexdûrên herî mezin ên darbeyê kedkar in. Niha jî bi firsenda OHAL'ê me diçewisînin. Ji Îş - Kur'ê 18, ji SGK'ê 25, ji maliyeyê 16, ji TÛIK'ê 3, ji edaletê 7, ji wezareta sporê 1, ji nifûsê 1 û bi giştî 71 endamên me ji kar derxistin. Bêguman dê ev roj derbas bibin û em ê bi ser bikevin."

www.arsivakurdi.org

## Belgefîlma Sarayê li Berlînê hat pêşandan

**BELGEFÎLMA** ku li ser jiyana pêşenga PKK'ê Sakîne Cansiz (Sara) hatibû çêkirin, li Tirkiyeyê hatibû qedexekirin. Lê belgefîlm li derveyî welat tê pêşandan. Li paytexta Fransayê Parîsê belgefîlma 'Jiyana Min Her Şer Bû' hat pêşandan. Belgefîlma der barê Cansiz de ji hêla Yekitiya Xwendevanên Jin ên Kurdistanê (JXK) ve li kampusa Zanîngeha Teknîk hat pêşandan û berdevkên xwendekarên zanîngehê jî piştgirî da pêşandanê. Sakîne Cansiz di 9'ê çileya 2013'an de li Parîsê bi du hevalên xwe Leyla Şaylemez û Fîdan Dogan re ji hêla MÎT'a tirk ve bi awayekî hovane hatibû qetilkirin. **PARÎS**





## Cezzar çû ser dilovaniya xwe

Şanoger û derhêner Engîn Cezzar di 82 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Cezzar di sala 2011'an de felçê lê dabû û di nava nivînan de bû, di 28'ê mehê de çû ser dilovaniya xwe. Cezzar bi lîstika 'Hamlet' di Şanoya Bajêr a Stenbolê de dest bi xebatên çandê kiribû û piştî ku Koleja Robert qedand, li Yale Drama School and Actors Studioyê perwerde dîtibû. Her wiha di gelek navendên wekî Dormen Tiyatrosu, Devekuşu Kabare, Şanoya Dewletê ya Stenbolê û Şanoya Dewletê ya Antalyayê de jî cih girtibû. Cezzar ji derveyî şanoyê di gelek fîlman de jî cih girtibû û derhêneriya fîlmê 'Kaldirim Serçesi' jî kiribû. **STENBOL**



## Li şûna bilêtan pirtûkên zarokan

Lîstika bi tevgerên laş dertê pêşberî temaşevanan, balê dikişîne ser mîzaha reş. Derhêneriya lîstikê Erkan Kiliç kiriye. Kolaj, Beckett ji 5 beşên kurt pêk tê. Sernavên bûyîn, jiyan û mirinê, bi dahûrandinên laşî derdikevin pêş. Her wiha di lîstikê de razberiya bifikar a daîmî, cîhaneke ji sentetîkiyê giliyan dike jî gelekî li pêş e. Dîsa şaşfêmkirina jiyanê ji nû ve tê pênasekirin. Pêşandana herî nêz di 12'ê sibatê roja yekşemê saet di 18.45'an de, dê di çarçoveya Mîhrîcana Zivistanê ya Kadikoyê de li Navenda Çandê ya Bariş Manço bê pêşandan. Di çarçoveya mîhrîcanê de li şûna bilêtan, dê pirtûkên zarokan bên qebûlkirin. **STENBOL**

# Ramanên Ocalan digihîjin gelê Misrê

*Li Misrê ji aliyê gelek weşanxaneyan ve Pêşangaha Pirtûkan a Qahîreyê hat vekirin û dê du hefteyan bidome. Di pêşangehê de gelek pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî cih digirin*



Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan piştî bi komployeke navneteweyî bi awayekî korsanvarî ji hêla hêzên navneteweyî ve dîl hat girtin û teslîmî dewleta tirk hat kirin, ev 18 sal e di bin tecrîdeke giran de tê girtin. Di pêvajoya 18 salên li girava Îmraliyê de Ocalan ji derveyî 5 parastinên xwe, di hevdîtinên parêzer, malbat û heyetan de îmzeya xwe avêt binê gelek rastiyên dîrokî û di vê alî de ji bo hemû cîhanê bû çavkaniya şêwirmendiyê.

Heta niha li Kurdistan, Tirkiye, Ewropa û gelek deverên din pirtûkên Ocalan hatin çapkirin û li gelek zimanan hatin wergerandin. Ji van pirtûkan û bi taybetî pirtûkên li girava Îmraliyê hatine nivîsandin, li gelek welatan li zanîngehan jî sûd jê tê wergirtin û dibin mijara perwerdeyê. Ev pirtûk di demên dawîn de li derveyî welat di gelek fûarên pirtûkan de tên pêşandan û gelên cîhanê jî ji birdozî û felsefeya Ocalan sûdê werdigirin.

Herî dawî li Qahîreyê bi beşdariya gelek weşanxaneyan, Pêşengeha Navneteweyî ya Qahîreyê hat vekirin û ev çend roj e didome. Di pêşangehê de pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî cih girtin.

Gelek pirtûkxane tev li pêşangeha pirtûkan bûn û gelek pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî pêşkêş kirin. Pêşengeha ku pirtûkên Ocalan tê de tên pêşkêşkirin, li Rojhilata Navîn pêşengeha herî girîng e.

Serokê Navenda Lêkolînên Kurdî Seyîd Abdulfettah diyar kir ku ew gelekî girîngiyê didin çapkirin û belavkirina fikrên Ocalan û dixwazin ev fikr û raman bigihîjin gelê Misrê jî. Abdulfettah aşkera kir ku belavkirina fikr û ramanên Ocalan li nav gelê Misrê girîng e û wiha axivî: "Fikir û ramanên birêz Ocalan ne tenê der barê gelê kurd, gelên hin herêman de ye, di heman demê de fikrên wî ji bo tevahiya cîhanê girîng in û divê ev fikr li tevahiya cîhanê bên belavkirin."

Abdulfettah anî ziman ku armanca wan a çapkirina pirtûkên Ocalan ew e ku doza gelê kurd, di nava rewşenbîrên Misrê de jî bidin nasîn. Midûrê Rêveberiya Pirtûkên Saziya Navenda Zanyarî ya kovara Octoberê Nasir Abdulrehîm Asî jî got ku li Tirkiyeyê çapkirin û belavkirina pirtûkên Ocalan ji hêla dewleta tirk ve hatiye qedexekirin, lê ew bê astengî pirtûkên Ocalan li Misrê çap û belav dikin.



Endamê Rêveberiya Saziya Navenda Zanyarî ya kovara October Nadir Celal jî aşkera kir ku Ocalan çepgirekî kurd ê mezin e û wiha pê de çû: "Ew xwediyê doz, rêgez û fikreke serkeftî ye. Em hêvîdar in ku hûn bi ser bikevin û welatê we baştir bibe. Ez Abdullah Ocalan û hemû kesên ku banga fikra demokratîk û azad dikin, silav dikim."

Dê Pêşengeha Qahîreyê bi pêşkêşkirina pirtûkên Ocalan, du hefteyan bidome.

*QAMIŞLO ANHA*

## Li Bismilê pirtûkxaneyek hat vekirin



Piştî ku li bakurê Kurdistanê bi biryara KHK'ê bi dehan saziyên zimanên kurdî hatin girtin, saziyên wek KURDÎ-DER li avahiyên DBP, HDP û saziyên civakî perwerdeyên ziman didomînin. Her çendî zextên dewleta tirk bidomin jî weşanxane û pirtûkfiroş xebatên xwe didomînin. Çend dildarên xwendina pirtûkên kurdî, li navçeya Bismilê ya Amedê pirtûkxaneya bi navê El Cezerî vekirin.

Hakan Altunç yek ji wan dildarên zimanê kurdî ye û wî jî piştgirî daye avakirina Pirtûkxaneya El-Cezerî. Altunç wiha axivî: "Ji her çar parçeyên Kurdistanê û ji bajarên Tirkiyeyê ji me re pirtûk hatin. Em niha êdî li gorî derfetên xwe karê xwe dimeşînin."

Xebatkarên pirtûkxaneyê herî zêde ji wê rewşê bi gilî ne ku kesên xwe wek welatparêzên kurd didin nasîn û ji hêmanên kurdîtiyê dûr in. Yek ji dameziîneran Bawer Ozgur aşkera kir ku ew dixwazin têgihîştina jiyanê ya ciwanên kurdan bi kurdî be û wiha pê de çû: "Dev ji xwendina kurdî berdin, gelek ciwan navê nivîskarên kurd nizanin. Gelek kes doza kurd û Kurdistanê dikin, lê nikarin navê nivîskarên kurd bibêjin. Armanca me ew e ku xortên Bismilê di vî warî de bigihînin." Di Pirtûkxaneya El-Cezerî de bi giştî 913 pirtûkên kurdî hene. Rêveberên pirtûkxaneyê bang li malbatên Bismilê dikin ku li vê pirtûkxaneyê xwedî derkevin. **AMED**

## Jineke helbestvan û dîroknas: Mah Şeref Xanim

Mah Şeref Xanim a ku bi navê Mestûre Kurdistanî tê naskirin, jineke helbestvan, dîroknûs û nivîskar e. Li gorî çavkaniyên nivîskarê kurd Dr. Soran Kurdistanî ew di sala 1805'an de li bajarê Sine yê rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Sine di wê demê de paytexta mîrekiya 'Erdelan' bû.

Mah Şeref Xanim di sala 1848'an de hîn di 44 saliya xwe de li Sineyê çûye ser dilovaniya xwe û li wir jî spartine axê. Lê li gorî çavkaniyên nivîskarê Kurdistanî, Mestûre di sala 1848'an de li Sine, di temenê 44 salî de çûye ser dilovaniya xwe û di goristana giştî ya Silêmaniyê ya Girdê Seywan a başûrê Kurdistanê de spartine axê. Li gorî hin çavkaniyan jî li Silêmaniyê çûye ser dilovaniya xwe.

Tê gotin ku ev jina navdar a kurd ji binemala qadirî ye. Keça Ebul Hesenê Mihemed Axa yê nazirê Kurdistanê ye. Bapîrê wê rêveberê xezînê yê mîrektiya Erdelanê ye. Hevjîna Xesrew Xanê Mîrê Erdelan e ku wek Xesrewê Nakam (Bêmirad) hatiye naskirin. Her wiha Xesrew Xan jî helbestvaneke jîrek e.

Mah Şeref Xanim bi qasî helbestvaniya xwe jî jineke xurt bûye. Di jiyana xwe de 20 hezar beyt bi zimanê farisî nivîsîne. Lê mixabin dîwana wê ya helbestan bi sedema pirsgirêk û qeyranên nav mîrekiya Erdelan winda bûye. Hacî Şêx Yehya gelek hewl daye ku beytên Mestûreyê peyda bike lê tenê hezar beyt berhev kirine. Ev helbestên Mestûreyê bi navê 'Dîwanî Mah Şeref Xanimî Kurdistanî' li Tehranê di sala 1925'an de hatine çapkirin. Pirtûkeke bi navê 'Dîroka Erdelan' jî nivîsiye. Ev berhem di sala 1946'an de li Sine ji aliyê Nasir Azadpûr ve hatiye çapkirin. *(KURDISTAN 24)*

### Mestûreyê 12 ilm qedandine

**HER WIHA** der barê olê de jî pîrtûkeke bi navê 'Şerîeta Îslamê' jî çap kiriye. Wê bi xwe 12 ilm qedandine. Der barê zewaca wê ya li gel Xesrew Xan de, di pirtûka Mîrekên Erdelanê de dibêje ku Xesrew demekê ji bav û mamê Mestûreyê aciz bûye û ji bo dilê wan xweş bike û aştiyekê çêke, Mestûre wek hevjîn ji xwe re aniye. Mestûre û Xesrew rêz ji hev re girtiye. Ev di helbestên Mestûreyê de jî dixuye bê çendî hez ji hev dikin. Hûnaneke di vê derbarê de wiha ye:

*"Ji bilî ser têkiliya wî min awir tune ye*
*jixwe ji bilî wî min fikar tune ye*
*her çi qas henaseya min ne li bîra min be, ji wî û min*
*Ji bilî henaseya sar min bîranîn tune ye*
*bextewar im li ber dûrbûna ji bejna wî ya bedew*
*Ji bilî xema wî qet min xemgînî tune ye*
*Îro, mîna saqî! ji çîmenan re demsal payîz e*
*Meyê bide, nefikire bê meh Remezan e*
*Li şîretên şêxî nefikire û ji dest re,*
*Ne çerxiyek û du û sê, ev fitwa min ji pîrê magan e"*

**BERHEMÊN WÊ**

Baweriya Îslamê û Rîsaleya Îbadetê (Farisî)
Dîwan (Dîwan-î Mastûrah Kurdistanî) (Farisî û kurdî)
Mêjûy Erdelan (Khronika Doma Ardalan: Tarîxî Ardalan/ Dîroka Erdelanê)



www.arsivakurdi.org

# Kulturê Moda



## Rêça kulturê verênan zaf gandar a

Şingalî de zî nê çîyê winasî estê. Urf û edetê eşîran de hewna zî bi şêwazê otantîkî nê çîyî yenê cuyayene. Cuyayîşê tîya tay vurîyayo, la hewna zî rêça kulturê verênan zaf gandar a. Pergala sermayedarî bi temamî zora tîya nêberdo. Cewherê komelî temamî nêameyo xeripnayene, tay bo zî, sey xo mendo. Naye ra ez fam kena ke moda, kulturo populer nê zemînî şaran ser o ameyo aver berdene. Labelê wexto ke no kultur yeno aver vistene, cewher ra yeno dûrî vistene, yeno xeripnayene. Bi no tewir avervistiş ra komel bihêz nêbeno, komel hêz ra keweno zeîf beno. Hetê komelbîyayîşî ra hişê komelî bihêz nêbeno, zeîf beno. Ganî na rastîye bêro dîyayene.

Îslamîyet xo xemilnayîşî mehkum keno. Bi no tewir duştîya xemilnayîşî, cewherê xo ra dûrî kewtişî îfade keno. Xemilnayîş yan zî moda, ganî goreyê cewherê komelî bêro kerdene. Komel pê bihêz bibo.

Şingalî de eşîra Çêlka esta. Na eşîre peynîya menga 12. de roşan fîraz kena. Roşanê Melekê Tawûsî. No roşan zaf şino roşanê Gaxanî yê dêrsimijan. Nê roşanî de xeylê çîyî yenê kerdene. Nînan ra yew zî yew la bestene xape û qirike ro. La bi di layan ra yena pê. Yew la sûr, a bîne zî sipî ya. Nê layî yewbînî ra yenê pîştene û bi no tewir beno yew layêka bîne. Na la hem xoxemilnayîş o, hem nasnameyê eşîr o. Bi na la fam beno ke o kes a eşîre ra yo. Hem sembolê eşîr o hem zî bi nê sembolî fam beno ke o kes bawerîya xo ra beste yo. Camêrdê eşîra Hebaba porê xo derg kenê û kenê gila. Gilayan zî sêneyê xo ser a verdanê. Camêrdê eşîra Feqîran zî erdîşê xo derg kenê. Camêrdê bi temen pîl ê, yew kumika otantîke nanê xo ser o. Na kumike zî bi hirîya varekan ra yena viraştene. Êyê ke porê ci sipî bîyo, porê xo boyax kenê. Ancî porqesnayîş cîya-cîya yo. Yew modelê moda çin o. Nê çîyî reng bi reng ê. Hetê xoxemilnayîşî ra zafrengî esta. Destpêkê nê urf û edetan şino reseno hezaran serran ra ver.

AZAD ARARAT

Merdimîye nika seserra vîst û yewine de ya. Na çend seserr a, xoxemilnayîş bîyo moda. Peydakerdişê modaya populîzmî aver şîyo. Pêroyê merdimîye naye ser o galegal keno. Moda hol a yan hol nîya? Tayê vanê moda hol a, tayê vanê moda hol nîya. Na babetî ser o fikrê cîya-cîyayî estî. Tayê vanê kulturo populer hol o, tayê vanê hol nîyo. Tayê qala festîvalan kenê. Holî û nêholîya nê çîyan ser o galegal kenê. Seba merdimîye xo xemilnayîş babetêko taybet o. Ganî merdimî xo bixemilnê yan nêxemilnê? Naye ser o galegal esto. Goreyê tayê kesan, xoxemilnayîşê camêrdan çiyêko zaf eyb û şerm o. Labelê tayê zî xoxemilnayîşê camêrdan hol vînenê.

Goreyê bawerîya îslamîyetî, xoxemilnayîş çîyêde rind nîyo. Çi cinî ba çi camêrd bo, ganî xo nêxemilnê. Cinîyî ganî xo bi çarşefa sîyaye bipîşê. Seba camêrdan zî xopîştiş sey ferman o. Nêbeno cinî û camêrd xo bixemilnê. Xirîstiyanî de zî rewşe yê îslamîyetî ra cîya nîya. Her di bawerî zî no het ra hemahema şinê bi yewbînî.

Çaxê sermayedarî de sinifa burjuva aver kewte. Bajarê girdî awan bîyî. Nufûs bi mîlyonan ama pêser. Cuyayîşê komelî zî ame vurnayene. Çîyê ke ma nika vînenê, xo xemilnayîşêko zêde û bêserûber yeno kerdene. No tewir xoxemilnayîş bi cinsê cinîyan dest pêkerd. Nika cinî zî camêrd zî xo xemîlnenê, bazin û goşare zî kenê xape û goşanê xo ra. Porê xo boyaxkerdiş û teşeyê qesnayîşî yê cîya-cîyayî û çîy-mîyê winasî aver kewtê. Eke ma no het ra tarîxî ra biewnê, xoxemilnayîş esto. Hem xoxemilnayîşê cinîyan hem zî xoxemilnayîşê camêrdan.

Tebîet de gandar zî xo xemilnenê. Hem heywanî hem zî dar û ber xo xemilnenê. Seba cinsê bînî her gandarê xo xemilneno. Zanayanê tebîetî zî êdî nê raştîyî tespît kerdê. No çaxo enformasyon de her merdimêk şêno xo biresno nê zanayîşan. Teyr tawûs xo winî reng bi reng kerdo ke merdim ci ra şaş maneno. Dîkî seba kergan xo xemilneno. Gul û vilikî xo xasek kenê. Tebîet de her estbîyaye xo xemilneno û xo xasekêr keno. Xoxemilnayîşî bin de xo dayîşqebulkerdiş, ancî xo dayîşheskerdiş esto. Têkilîya merdim bi merdimî ra merdim bi tebîet ra zî cewher de no yo. Mezgê feza de, dinya ser de zî yê gandaran de, naye yew raştî ya.

**Ganî merdimîye kom bi kom, eşîre bi eşîre, şar û neteweyê xo mîyan de modaya xo aver fîno. Her cayêk goreyê mewsîm, keş û hewa û cografya çina xo ra dano û xo xemilneno. Ganî her kom û eşîre goreyê cuya xo xemilnayîş û çina xoradayîşê xo aver fîno**



***Moda ganî goreyê cewherê komelî bêro kerdene***

Yew arkeolog cayêkê Kurdistanî de cigêrayîş keno. Qandê ci xo rê karkeran ano û xebitneno. Arkeolog şikeftan de hîyeroglîfan vîneno. Hîyeroglîfan de yeno dîyene ke camêrdî bi vilikan xo xemilnenê. Badê cû arkeolog vîneno ke karkerî zî sey hîyeroglîfan ra aseno, xo bi vilikan xemilnenê. Naye ver arkeolog şaş maneno. Bêguman urf û edet genetîk o û bapîr û dapîran ra maneno. Labelê, çi heyf, modakerî destwerdana nê urf û edetanê verênan kenê.

Xoxemilnayîşê cinî û camêrdan çîyêko tarîxî yo. No urf û edet hezaran serrî yo ke domîyeno. Mîtolojîya nuşteyî û yê fekkî ra zî na fam bena. Bitaybetî komelê ma de bawerîya îslamîyetî xemilnayîş sey tomete mojneno. Zafrengîye çin keno. Heme çî beno sîya û sipî. No feraset goreyê tebîetê komelî nîyo.

Ganî merdim işaretê cuya burjuwazî zî bikero. Bitaybetî zî postmodernîzm cinîyan akenê, bêpêman wêran kenê. Xemilnayîşê netebîî aver fînenê. Bitaybetî kes yan zî kom vejîyayê. No het ra qadêko sermaye ronîyayo. Kesê namdarî estê. Ê herinda komelî de fikirîyenê. Kam, çi, senî xo ra do, makyajê xo senîn bo, hetê nînan rê yeno dîyar kerdene. Dem bi dem, goreyê mewsîman, moda aver fînenê. Bi defîleyan mojnenê komelî. Medya zî goreyê naye yena bi rêk û pêk kerdene. Bi emelîyatanê estetîkî dest verdanê leşê merdiman ro. Çina xoradayîş do senî bo, hetê modakaran ra yeno dîyar kerdene. Moda komelî mîyan ra xo bi xo aver nêkeweno.

Avervistişê moda de hişê destfînayîşê kar esto. Modakar bi viraştena moda ra wazenê pereyî dest fînê. Modakarî seba weşîya komelî, avervistiş û seveknayîşê komelî ney, seba pereyan nê karî kenê. No zî çîyêko sosyal ney, asosyal o. No çî çîyêko tewr kambax o. Cewherê komelî dînamît keno.

Ganî merdimîye kom bi kom, eşîre bi eşîre, şar û neteweyê xo mîyan de modaya xo aver fîno. Her cayêk goreyê mewsîm, keş û hewa û cografya çina xo ra dano û xo xemilneno. Çolê Erebîstanî de pantolon xoradayîş bêfayde yo. Kiras xoradayîş hîna holêr o, seba ke hewa zaf germ o. Welato ke keş û hewayê ci serd o, uca pantolon xoradayîş hîna holêr o. Seba ke pantolon goreyê kirasî hewayo serd de merdimî germ keno. Kurdistan de hem hewayo serd hem zî hewayo germ esto. Tayê cayan de hamnan, zimistan û wisar pîya yeno cuyayene. Eke merdim şiro wareyan ser, zimistan o, kaşê ware de wisar o, gelîyan de zî hamnan o. Kurdan welatê xo yo serdin û germin de, cografya û mewsîman ver se kerdo? Çinayê şal û şepikî aver visto. Koyan de dar û ber mîyan ra bi kiras û pantolon şîyayîş, veriştiş û roniştiş zehmet o. Eke çina şalwar bo, cuye zaf rehet a. Dar û kemeran mîyan ra bi şalwar şîyayîş asan o. Coka ganî her kom û eşîre goreyê cuya xo xemilnayîş û çina xoradayîşê xo aver fîno. Xemil û moda eke vînd bo, komel beno komelêko wayîrê weşîye û rindîye. Kes xasekîya xo ya bedenî xo rê nêkeno problem. Bi no tewir xasekîya ruhî û bedenî resenê yewbînî. Komel zî kokê xo ser newe ra aj dano.

***No nuşte keyepelê Dêrsiminfo ra ameyo girewtiş*






# Ganî yewî awan bibo

**Nuştox Umur Hozatli û Fuat Onenî derheqê yewîya neteweyî de qisey kerdî. Hozatliyî va 'ganî tarîx ra ders bêro girewtiş' û wina domna: "Seba awankerdişê yewîya neteweyî û pîya cuyayîşî lazimî bi ti şertan çin o"**

SADÎYE ESER / SADIK TOPALOGLU / STENBOL - DÎHABER


Umur Hozatli


Fuat Onen

Nê demanê peyênan de munaqeşeyê derheqê Yewîya Neteweyî ya Kurdan de xeylê zêde yî û her ke şono hîna zêdeyêr benî. Heta nika xeylê sîyasetmedar û hunermendî fikr û vînayîşê xo ardî ziwan.

Babete ser o nuştox Umur Hozatli û Fuat Onenî qisey kerdî.

Onenî qiseykerdişê xo de va 'serranê 1914-18 de rêxistinê sey Cemîyeta Tealî ya Kurd estbî û hetê temsîlkerdişê kurdan de zeyîf mendênê' û wina domna: "Xora o wext Rojhelat de çîk çinêbî. Vakur û Başûr zî o wext bin hakimîya Osmanî de bîy. Kurdê ewja de zî otonom waştêne û hetê Osmanî de ca girewtêne. 1875 ra heta peynîya şerê dinya yo 2. pêro pîya 175 dewletî awan bîyî. Hêzê o wextî seba ke awanbîyayîşê Kurdistanî de menfîetê xo nêdîy, destûr nêdayî ke Kurdistan awan bibo. Eke o wext yewîya kurdan bibîyêne, ewro kurdî nuqtayêka cîya de bibîyênê."

### HEDEF YEWÎ YO

Onenî dewamê qiseykerdişê xo de va 'eke merdim şert û mercê ewro ra biewnîyo, vîneno ke sîyasetê kurdan aver şîyo û seba kurdan avantajê neweyî estî' û wina dewam kerd: "Ewro Sûrîye û Îraq krîzî ver felç bîyî û Tirkîya zî ver bi felçbîyayîşî şona. Îran zî krîzî ra zaf dûrî nîyo. Eke dişmenê merdimî mîyanê krîzî de bibo, no seba merdimî avantaj o. Labelê tîya de yê muhîm sîyasetê kurdan ganî çi esas bigiro. Her parçe mîyanê xo de programêk virazeno, ganî programêko ortax bêro viraştiş. Goreyê mi no ancax bi Kurdistanêko xoser çareser beno. Ma zaf nizdîyê serkewtişî yî û ganî ma yewîya xo awan bikerî."

### TENA ŞERT YEWÎ YO

Nuştox Hozatliyî zî va 'parçebîyayîşê kurdan bi dagîrkerdişê Kurdistanî yê Îslamîyetî ra dima dest pêkerdo' û wina dewam kerd: "Tîya de rol û mîsyonê îdeolojîyê îslamîyetî zêde yo. Seba ke kurdî yewîya xo awan bikerê, vera kurdan de ti astengî çin o. Tena şertêk esto o zî yewî yo. Hêz û partîyê sîyasî eşkenî seba nêyî bixebetyî. Reyna rolêko gird keweno roşnvîranê kurdan ser de. Eke sîyaset ra dûrî, çarçeweya îdeolojîyê Yewîya Neteweyî ya Kurdan de yewîya roşnvîran bêro awankerdiş, o wext do vernîya sîyasetî zî biabo. Yê ke Yewîya Neteweyî ya Kurdan awan bikerî KCK, PDK, YNK û Tevgerê Goranî yî."

### ÇIRA NÊBÎ CEWAB


Hozatliyî peynîya qiseykerdişê xo de mektuba ke hetê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ra seba Serekê PDKyî Mesut Barzanîyî amebî erşawitiş, ard vîr û wina qedêna: "Seba çi vengdayîşê Ocalanî rê nêbîy cewab. Raştîya xo de yewîya esasî kultur, huner, edebîyat, ziwan, sînema, tîyatro û ekonomî de beno. Ganî ruhê yewîye bêro tepiştiş û no zî wezîfeyê raştikên yê roşnvîranê Kurdistanî yo. Şarê kurd sey verê bêhêz û zeyîf nîyo. Ronesanso ke PKKyî Vakur de viraşto, tesîrê xo parçeyanê bînan ser de zî kerdo. Wezîfeyo gird keweno milê sazîyê sîyasetî û roşnvîran ser de; ganî roşnvîrî sazîyê sîyasî ser de tesîr bikerî. Eke ma wezîfeyê xo bikerî, ma do serbikewî."

## 2016 de 101 hezar 612 cayê karî padîyayî

Hukmatê AKPyî 15 serrî yo ke îqtîdar de yo û mîyanê nê 15 serran de bin nameyê başkerdişê ekonomî de polîtîkayê ke ameyî meşnayîş, bîyî sebeb ke ekonomîya Tirkîya bêra îflasî ver. Çend serranê peyênan de û bitaybetî teşebusê derbe ra dima polîtîkayê şerî ameyî meşnayîş û nê zî bîyî sebeb ke Dolar û Euro vay bibî. Heto bîn ra xeylê karkerî karî ra ameyî eştiş. Hêzê herînayîşî yê şarî zî kewto duştê tewr cêrî.

Goreyê doneyê ke Konfederasyonê Hunermend û Esnafanê Tirkîya (TESK) dayo, serra 2016 de 101 hezar 614 esnafî cayê karê xo padayî. Na hûmare 2015 de nizdîyê 97 hezar 715 bî. 3 aşmanê peyênan yê 2016 de her aşme dormeyê 10 hezar esnafan kilît da berê xo ro. Reyna goreyê doneyan, na hûmare tewr lez Şirnex de kewta. Tena Amed de serra 2016 de 10 hezar esnafî cayê karê xo padayî. ***AMED***





## Sey verên rengin nîya

MELEK YUKSEL / AMED – ANF

Serra 1895 de qezaya Sûrî ya Amedî de Bazarê Simerî, Qazanvanan, Kurkroşan, Saraçvanan û Cadeyê Melek Ahmetî de şewat vejîyeno û no şewat 3 rojan dewam keno. Şewatî ver Sûka Derge de heme dikanî veşenî, benî wel. Cok ra na sûke ra vanî Şarşîya Şewitî (Sûka Veşate).

Goreyê tayînan seba ke na sûke de xeyrî muslîmî estî û zaf dewlemend bîyî, no şewat seba vernîgirewtişê dewlemendîya înan bi zanayîş ameyo vetiş. Serra 1914 de na sûke de reyna şewat vejîyeno û reyna sûke bena wele. Na sûke newe ra yena awankerdiş û na rey tede muslumanî xebetîyenî. Her çiqas ke sûke hende reyan veşîyena zî, na sûke rol û mîsyonê xo ra çîyêk vînî nêkena.

Sûka ke verê cû mîyanê ci de peme, cam, birîsim, karê çînîvanî, çîtare û sewbîna meslegî estbîy, nika hîna zafêr sol, zuccacîye, asin, sifir û dikanê xalîyan tede estî.

### TESÎRÊ KRÎZÎ

Sûka ke bi renginîya xo bîya sembolê Amedî, nê rojan de bêvengîyêka girde tîya de hakim a. Kanûna 2015 ra nata bin nameyê qedexeyê tebervejîyayîşê kuçeyan de rijnayîşêko gird ame kerdiş û kûlubêyê polîsan qeza açarnayo hepisxaneyêko akerde. Cok ra sûka ke verê cû merkezê bazarî bîye, nika ti kes nêşono na sûke. Zafaneyê sûke de esnafan dikananê xo padayo.

Sûke de esnafî çîyê ke rotêne û nameyê dikananê xo yê bi kurdî ver, tim raştê zext û tedayan ameyênê. Labelê nika esnafî dîyar kenî ke bêkarî ver xeylê dikanî ameyî padayîş, eke bi hawayêko lez mudaxale nêro kerdiş, o wext sûka ke verê cû bi şewatî ver çinî nêbîye, do rewşa ekonomîk ver çinî biba. Esnafî vanî ke seba krîz ra vejîyayîşî tena rayîrêk esto, o zî agêrayîşê masaya muzakere yo.

Esnafê Sûka Rusî ya Pîle:

## Emser esnafî qedîyaya




Tirkîya de seba ke krîzê ekonomî esto, esnafî îflas kenî û berê dikananê xo padenî. Qezaya Rayîrê Îpegî ya bajarê Wanî de mîyanê serrêk de 603 esnafê ke Sûka Rûsî ya Pîle de bazirganî kerdênê, dikanê xo padayî. Esnafê Sûka Rûsî ya Pîle, proseso tewr xirabin yê 25 serran cuyenî. Proseso ke 24ê temuza 2015 de dest pêkerdbî, teşebusê derbe ra dima bi îlankerdişê OHALî bi seyan esnafî mexdûr bîyî.

Babete ser o esnaf Zabît Hanoglu, Kenan Olmez û Muhammet Tucîyî qisey kerdî.

Zabît Hanogluyî bale ant krîzê ekonomîkî ser û wina va: "Wexto ke turîstî kêmî bibî, herînayîş û rotiş zî kêmî beno. Ekonomîya şarê tîya baş nîya û nêeşkenî nan bîşêrî keyeyê xo. Çimkî bazirganî turîstan ser de bena. Seba başbîyayîşê rewşe, ganî no proseso xirabin bêro wedarnayîş. Esnafê ke cîranê ma bîy seba ke nêeşkayî kîraya xo bidî, berê dikananê xo padayî."

### ERDLERZ DE KEYEYÊ MI RIJÎYA







Kenan Olmezo ke 2 aşmî yo nêeşkeno kîraya dikanê xo bido, qisey kerd û wina va: "Proseso xirabin ver êdî turîstî nînî. Seba ke ez dêyndarê ti kesî nêba û bieşka kîraya dikanê xo bida, mi banka ra kredî ant. 6 aşmî yo ke ti kes nîno dikanê mi. Ma saya turîstan debara xo kerdênê, labelê nika turîstî çin î. Ma kewtî binê deynan. Erdlerzê Wanî de keyeyê mi rijîya, la reyna zî mi hende zehmetîyî nêant."

Esnafan ra Muhammet Tucîyî zî qala rewşa esnafan kerd û va: "Karê ma heta 7 aşmî ra ver zî hende xirab nêbî. Verê cû hûmara turîstê Îranî zêde bî. Îranijan hetkarîya tewr zêde dayêne ekonomîya Wanî. Ez her aşmî 500 TL kîra dana, labelê nika ra pey rewşa mi çin a ke ez dikanê xo akerde verda û kîra bida." **WAN - DÎHABER**

## Cinîyî bi kede û rengê xo estî

Proseso nikayîn de şer û polîtîkayan ver krîzê ekonomî yeno cuyayîş. Sey ke yeno zanayîş no proses de tewr zêde cinîyî mexdur benî û merdimî bêkarî ver zehmetîyan ancenî. Nê cinîyan ra yewe zî Fehîmeya 53 serreyîya ke Qamişlo de cuyena û seba ke muhtacê ti kesî nêba bi laj û mêrdeyê xo firina nanî ya El Hara de xebetyena.

Babete ser o dayîka Fehîmeye qisey kerde.

Fehîmeye va 'ma seba pewtişê nanî, serê sibayî ard herînenî û şonî firine' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Serê sibayî ma rew werzenî û seba viraştişê nanî ma mîr elawenî. Dima ra ma dest bi viraştişê nanî kenî û pewcenî. Sey zehmetîya heme xebatan, karê ma de zî zehmetî esta. Ma tewreyêk ardî 8 hezarî ra herînenî û mazotî zî komînê taxî ra temîn kenî. Tena ma rojanê çarşemeyan nêxebitîyenî."

### EZ KARÊ XO RA KÊFWEŞ A

Fehîmeye qiseykerdişê xo de kêfweşîyê karê xo arde ziwan û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "Her çiqas ke karê ma de zehmetî bibî zî ma karê xo ra kêfweş î. Ma cinîyî bi keda destê xo hetkarîye danî debara keyeyê xo. Ez çiqas hetkarîye dana keyeyê xo hende kêfweş bena. Cinîyî heme taxan bi kede û rengê xo estî." **QAMIŞLO - ŞÛJIN**



ROJEVA
# Medya
31 Çile Sêşem 2017

**ROJEVA MEDYA**
**Ararat Basın - Yayın**
**Reklamcılık Adına**

İmtiyaz Sahibi:
**Murat SEKMEN**

Yazı İşleri Müdürü:
**Mehmet Çetin ALTUN**
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
***Yenişehir-DİYARBAKIR***

***Tel:*** 0 (412) 224 35 93
Baskı ***(ÇAP):***
***İstanbul:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.


Akasya Sok. ***No:*** 23/A
***Küçükçekmece İSTANBUL***
***Tel:*** 0 (212) 580 63 81
***Adana:*** Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
***No:***13/A ***Yüreğir / ADANA***
***Tel:***0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
***e mail:***
rojevamedya@hotmail.com



## Fotografekê

Rojnivîska



Selmet
**GULER**
selmetberfin@hotmail.com

# Ji Mêrdînê ber bi Çiyayê Agirîn ve



Ji Mêrdînê heta Kevirê Qul mij, ewr û baran. Li Kevirê Qul baran guhêzî dewsa berfê bû. Wekî hêka mêkewê bilindahiya çiyayên li derdorên deqdiqandî. Rê bi kofî li hev dizivire. Ji nava gundên devê rê dûxana kulekên xaniyan bi fetl hildikişe û wekî parçeyeke mijê bin, pê re dibin yek. Li quntarên binkendal keriyên pez û şivan berbiçav dibin. Rê çendî hildikişe belekiya çiyayan bi gewriyê re cih diguhere. Rêya qîrkirî yekser li ber çav zirav û dirêj dibe. Bajarê ku bêtir bi kevnbûn û dîroka malmîrên Bedlîsê tê nasîn li paş min dimîne. Wekî gewriya hêkê erd û asîman tev spî. Mîna derbasî dinyayeke neditî û nebînayî bûbim hestdariyek peyda dibe li min.

Di vê qiyametê de bêtir ji rê, li derdora xwe dimeyzînim. Ji gulîberfa ku ji asîman ber bi erdê ve dilîlîne tiştek naxuye. Çav li quntrastekê digere ku wê bikim çarçoveya fotografekê lê ji homojeniya gewriya xwerû pê ve tiştek naxuye. Mîna barê min hêk bin bi tirs diçûm. Rêya ku vinevina siwareyan jê kêm nedibû, mîna nîvê çolistaneke bêjiyan be, bê deng bû. Xofa tenêtiya bêtirîn a berfê, berfa ku mirina spî bi xwe re tîne li min peyda dibe.

Çima ditirsiyam? Serê pêşîn mîna pêlîstokekê bi min hatibû, niha çi ye? Fenanî îna çivîkekî reş li ser guliyê dilê mirov datîne? Qufalî, xewa-spî ya ku mirov tafî reşê mirinê dike... Çendî dijwar e tirsa mirina bi tenê. Ez diçim. Li navbesteke kûr, şêwlê bestekê şînahiya herikbûna avekê ber çavên min dikeve. Li pêpelûka mirinê mîna rasteberî ferîşteyeke jiyanê hatibim xwe li qiraxa şênahiya avê digirim. Wênegirê datînim ser sêpêyê, dikevim ber kêşana rengşîneyê çemê ku jiyanê bi xwe re tîne. Reşçivîkê li guliyê dilê min dibe pirt û ber bi gewriya spiyê mirinê ve difire.

Ne tirs, ne xem, ne jî xof hemû bi hev re barên xwe ji nava milên min berdidin jêrê. Xwe wek piriyekî çivîkekî çilmêre sivik û şad hîs dikim bi yek carê. Lê guliyên berfê mîna li ser perdeyeke tûlî tenik bê, di navbera min û şînahiya avê de dikevin jêrê û nahêlin roniya li ser ava golê bi rêk û pêk bigihîje ser nîskoya lensê û rastêka fîlm. Bi sertiliyên recifî sêpêya xwe bi hev didim.

Dikevim rê dîsa. Çima ku mirov fotografan dikêşe tirs û sermayê hîs nake min gotibû xwe bi xwe? Rê zirav e, navnîşana biçimê dûr û dirêj e. Xema min ne dûrahiya navnîşana biçimê, bêtir berf e, berfa rê girtî, berfa ku rêyan li ber rêçûyan digire û guliyên dilan nêzî reşê zerzûl dike. Esra dereng e. Ditirsim reş bikeve erdê, bimînim li rê. Her bi wê ve diçe guliyên berfê ku li ber bayê li hev dileyizin har û mezin dibin. Her ku diçim sir û seqema serhedî min ji qudûm dixe. Geh hildikişim çiyan, geh dadikevim newalên kûr ku xwedan jî xwe li wan nabîne. Carinan dixijiqim derveyî rê. "Lastîkên berfê jî fêde nakin" dibêjim ji xwe re.

Digihîjim Wanê, bajarê malxirabûnê. Li ser rêya Ercîşê mîna koçerên bêwext berf li wan hatî, konê kesên ji erdhejê bê mal û meydan mane, ketin ber çavên min. Ber bi keviya gola Wanê ve diçim êdî. Mîna cil û bergên bûkeke rûbixêlî li ser hespê her dever spî, hew rûyê golê kever dixuye. Ji bilî şînbûna golê erd û asîman yek ker. Ne bilindahiya çiyayê Sipanê, ne spîndarên ku nav navan mîna du dilgirtiyên li kêlekî hev dirêjî asîman dibûn dixuyin. Her der mij û moran. Hew ewrên berfîn ku xwe bi ser rûyê golê de dadidin tariya ava golê didin pêşiyê. Piştî kaşê gundê Canikê û fetlên li qiraxa golê dikevim rasteyekê. Gund û deşt û newal bi rev li dû min dimînin. Dûxana sobeyên gundekî ji dûr ve dixuyin. Li guhê gund, li ser goristaneke li çolbeyarekê reşê çend kesên ku destên wan ber bi valahiya asîman ve vekirî û ketibûn ber parînan, ketin ber çavên min. Min lingê xwe avête frênê lê min nediwêrî li gorî dilê xwe pê lê kiribana. Dîsa jî qûna tirimpêlê mîna dûvê werdekekê diçe û tê. Heta radiwestim sed metreyî dûr dikevim. Dageriyam, li derba wan, li qiraxê rawestiyam.

Bi vekirina derî re bi bayekî



cemedî tevî guliyên berfê li rûdêna xwe hîs dikim. Wekî bêjin "ev kî ye" kesên li ser gorê li xwe fitilîn û yekawir li min nehêrîn. Wekî xwe bidim nasîn wênegirê bi wan ve hildidim. Bi hildana destî re hiseke nimz têr lava û rû şermînê beşişîn "ez dikarim fotografên we bikêşim" ji nav derizîna lêvên min dertên. Dema min qala fotografan kir jinan ber dagera. Mêr û zarokekê hêj li min dimeyizand. Dengekî ku di nava guliyên berfbaranê de bi zor xwe gihandibû min "tu dikarî" gotibû ji min re. Di nava guliyên berfê de ku şolî ji min dixuyan, min berê dirêjeka lensê bi wan ve kir. Piştî çend fotografan lepên wan ên vekirî ku mîna guliyên berfê ber bi bejna wan de hatin xwar. Mêr li pêş, jin li paş, keçika biçûk û kûçikekî bozegewrî herî li paş, bi ristik berê xwe da gund, xaniyên ku keldûxanê li ser serê wan dilîst û diçû kûrahiya asîman. Ez jî ketim rê û ber bi bilindahiya Çiyayê Agirîn ve hilkişiyam.



# Li Kocaeliyê Bazara Xwezayî

Komeleya Jiyanê ya Ekolojîk a Kocaeliyê û Komeleya Genim bi hevparî Bazara Organîk ava kir. Li Bazara Organîk ku li navçeya Îzmîtê ya Kocaeliyê hat avakirin, berhemên organîk ên ji gelek bajarên Tirkiyeyê li vir kom dibin û tên firotin.

Di pêşengiya Komeleya Jiyanê ya Ekolojîk a Kocaelî û Komeleya Genim de li navçeya Îzmîtê ya Kocaeliyê bi navê 'Bazara Organîk' bazarek hat avakirin. Hemû rojên şemiyê li navçeya Îzmîtê Bazara Organîk ava dikin û berhemên ku ji gelek bajarên Tirkiyeyê tînin, li vir difiroşin.

Esnafê bi navê Nurettin Kayapinar ku sêvên organîk ji Afyonê tîne û li vir difiroşe, diyar kir ku bi avakirina bazareke wisa pir kêfxeş e. Kayapinar anî ziman ku ew sêvên xwezayî yên li çiyê çandine kom dikin û li vê bazarê difiroşin. Kayapinar da zanîn ku ev sêv xwezayî ne û tu madeyên kîmyewî di nav de tune ne. Esnafê ku nanê ji hevîrtirşê genim çêdike Latif Yildirim jî anî ziman ku bi rêbaza xwezayî û kevneşopiya berê hevîr haveyn dike û bi hevîrtirşê nan çêdike. **KOCAELÎ – DÎHABER**



# Dayika xalîçeyan: Sîsey



**Sîsey Karayilan ev 61 sal e benên rengîn tîne gel hev û bi motîfên cuda xalîçeyan çêdike. Sîsey dibêje ku ev karê dayika wê bûye û got ew bêriya dost, piştevanî û têkiliyên berê dike**

Sîsey Karayilan (75) li gundikê Sakaltutan ê Bîrecîka Rihayê dijî. Dayika Sîsey di xaniyekî ax de dijî û şahida xizanî, êş û zilma li vê erdnîgariyê ye.

Dayika Sîsey diyar dike ku ew 4 bira û 7 xwişk bûne û dê û bavê wê li ser zeviyan xebitîne û debara xwe wisa kiriye. Sîsey qet neçûye dibistanê. Jixwe li gundê wan dibistan tune bûye û wê jî hewesa dibistanê nekiriye.

Sîseyê tu carî qedera xwe bi xwe tayîn nekiriye û yekane qada azad a aîdê wê, çêkirina xalîçeyan bûye. Li gorî xwe rengên cihêreng anîne cem hev û xalîçe çêkirine. Di 14 saliya xwe de ji dayika xwe hîn bûye û 61 sal e qet dest jê bernedaye. Di 25 saliya xwe de zewiciye û dîsa dev jê bernedaye.

Keçên gund bi piranî di 14-15 saliya xwe de dihatin zewicandin. Ew di 25 saliya xwe de dizewice. Sîsey jineke pir xweşik e û ji ber vê dê û bavê wê, naxwazin wê bizewicînin. Piştî demekê mezinên malê biryarê didin û wê didin kurxaltiyê wê. Li ser pirsa me ya 'Te jê hez dikir?' jî wiha dibêje; 'Hezkirin çi bû me nedizanî, şerm bû.'

Sîsey dibêje ew ji hevjînê xwe razî bûye û dilê wê neşikestiye. Hevjînê wê li sînor pê li mayînekê dike û birîndar dibe û 30 sal berê jiyana xwe ji dest dide. Dayika Sîsey bêyî hewcedarî kesî bibe 8 zarokên xwe mezin dike û dizewicîne. Lê nekariye wan bide xwendin. 49 neviyên dayika Sîsey hene. Bi piranî keç in; Qendîl, Bêrîtan, Rozerîn… Dayika Sîsey da zanîn ku wê gelek bêriya dost û têkiliyên berê kiriye.

Dayika Sîsey dide zanîn ku gelek xalîçeyên ku çêkirine, dane kesên ji şer reviyane û her wiha di dema erdheja Wanê de jî ji erdhejzedeyan re xalîçe şandine. ***RIHA - ŞÛJIN***



# Sersarî dêra qedîm hildiweşîne

Li navçeya Qoserê ya Mêrdînê Dêra Surp Kevork a ermenan ji ber xemsariyê dike hilweşe. Ji salên destpêkê yên komarê heta 1977'an dêr ji aliyê Midûriyeta Çandiniyê ya Bajar ve wek depoya dermanên çandiniyê tê bikaranîn.

Dêra ku bi salan wek depo hatiye bikaranîn û li gorî vê bikaranînê jî ji betonê qatek hatiye çêkirin û cewhera wê ya dîrokî hatiye texrîbkirin.

Dîsa li tu cihekî jî tabela tune ye. Ji ber ku bi salan wek depo hatiye bikaranîn, bêhneke genî ketiye hundirê dêrê. Dêr di demên dawîn de dewrî Weqfa Katolîk a Ermenan a Mêrdînê hatiye kirin. Lê ji ber ku derfetên weqfê jî kêm in, weqf jî nikare dêrê restore bike.

Malbatek li baxçeyê dêrê di malekê de dimîne û dibêje ku nikarin tiştekî bikin. Malbatê ev agahî dan: "Berê turîst dihatin vê derê. Lê îsal gelek aciz kirin. Polîs her tim tên û dibêjin kî tê vê derê, bila agahiya me jê hebe." **MÊRDÎN - DÎHABER**